# MEWLÎDA PÊXEMBER

DESTNIVÎSA KURMIANCÎ
BI TÎPÊN OSMANÎ

XOCE MIHEMED NEZMÎ ELÎ ÎMADIDDÎN
(1907--1963)

## Rastanîna Zimanî
## û
## Veguhastin ji Tîpên Osmanî


Dr. Mihemed Ebdo Elî



Efrîn 2014

# MEWLÎDA PÊXEMBER

## DESTNIVÎSA KURMIANCÎ

## BI TÎPÊN OSMANÎ

# XOCE: MIHEMED NEZMÎ ELÎ ÎMADIDDÎN (1907-1963)

****

**Rastanîna Zimanî**

**û**

**Veguhastin ji Tîpên Osmanî**

## Dr. Mihemed Ebdo Elî

**Eferîn... 2014**

## *DANASÎN:*

*Mihemed Nezmî kurê Elî Îmadiddîn. Bavê wî Mile Elî ye, bi Xoce dihat nasîn, û bi lexem jê re digotin: Xocê 'Umdînê:*



*Mihemed Nezmî li sala 1907an hatiye cîhanê û li sala 1963an çavên xwe damrandine. Ew li Kilisê fêrî xwendin û nivîsandin û zanînên Olî bûye, û ji bavê xwe yê ''Mille'' jî fêrî gelek tiştên ola Îslamî bû bû.*

*Xoce Nezmî li gundê xwe Gemrûkê Xoce bû, zarokên gund û gundên derdorê fêrî xwendin û nivîsandina Erebî dikirin.*

*Ji bilî wê, wek heyama wan deman, wî nivişt jî ji bo pirsgirêkên civakî, tendurustî û hwd dikirin.*

*Ji vê destnivîsê xuya dibe, ku ew xêzekêşekî baş bû jî û nivîsa wî ya bi tîpên Osmanî pir baş nivîsîndiye û tên xwendin jî.*

*Zaro û neviyên wî li gundê bav û kalê wî li Gemrûkê dimînin û lê dijîn.*

## Beş û naveroka destnivîsê

Mîna ku nava rûpelên destnivîsa mewlîdê hatiye, ew li sala 1369.g/1949.z bi tîpên Osmanî hatiye nivîsandin.

Mewlîd ji van beşan pêk hatiye:

1- Kurte destpêk: Çend xêzik in, bi selewatan dest pê dike, pişt re daner xwe dide nasîn: ((Mewlîda hedret Mihemed li ser zimanê Kurdmancî terceme bûye, û muelifê wê ji gundê Gemrûkê Ebdê Xwedê Mihemed Nezmî Xoce ye)).

2- Werin mewlîdê: Nivîskar tê de dozê li herkesekî dike, ku li mewlîdê amade bibin, û qencî û sewaba bihîstin û guhlêdana wê diyar dike û dipesine. Di nava malikên wê de meqama bilind a pêxember Mihemed El Mistefa dide xuyan û pesnê dide.

3- Beyana qudreta Xwedê: Di vê beşê de kanîn û qudreta Xwedê ya gewre xuya dike, û xuya dike jî wî çawa erd, ezman û hemî pêkhatî û heyînên wan afrandine û ji mirov re kirine şanşûret û ayatên kanîn û serdariya wî li ser heyînên gerdûnê.

4- Beyana qedra Nebî û mikalema erd û ezmên. Ev beşa risteke hevpeyvînî ye di navbera erd û ezmên de ye. Di naveroka wê de, li destpêkê ezman xwe bilind dibîne, heyînên xwe dipsine û erdê bi

nerindî û kêmaniyê salix dide, lê Xwedê dilê erdê xweş dike, û wê bi hatina Pêxemberê wî Mihemed li ser rûyê erdê wê bextewartir dike, lê ew ezmên jî bi mî'rac û seredana pêxember Mihemed ji ezmên re dilxweş dike.

5- Xulqeta nûra Mihemed 'eleyhî sselam: Di rista wê de xuya dike çawa Xwedê Mihemed ji nûra xwe çê kir, û erd û ezman jî ji bo xatirê wî afirand. Pişt re Adem ji axê çê kir, û nûra Mihemed xiste pişta wî, û ji Parsiya Adem Hewe afirand û her du xistin bihuştê, lê Iblîs bi Hewê kenî û kir ku ew û Adem ji dara ''Gênim'' bixwin, ji ber wê jî ew ji bihuştê derxistin ser erdê. Lê belê pişt re ew her du poşman bûn, Xwedê jî li wan hat rehmê û poşmaniya wan qebûl kir û bi hev re kirin jin û mêr. Û herwiha wê gavê, nûra Mihemed ji ser Adem çû ser kurê wî ''Şîs'' û pişt re neviyên wî, ta gihîşt Ebdella bavê Mihemed û pişt re di hebûna Mihemed de diyar bû.

6- Beşa şeşan bi navê ''Hatina wicûdê ya Ebdella bi xêr û silamet'' hatiye nivîsîn.

7- Mizgîn ji Emînê re: Tê de diyar dike, çawa Ebdella bi Emînê re zewicî.

8- Beyana mewlîda Mihemed Mistefa: Di rista wê de diyarbûna nûra Mihemed di eniya bavê Ebdella Ebdilmutelêb de tîne zimên. Û çawa hemî

mezinên Mekkê keçên xwe ji bo zewacê bi ber Ebdella digirandin, û çawa Weheb keça xwe Emîn ji bo zewaca bi Mihemed re li ser Ebdilmutelêb pêşniyar kir û çawa hat qebûlkirin û bi hev re zewicîn. Pişt re hewaldide çawa Emîne bi ducanan bû, û çawa li her mehekê pêxmberekî seredana wê dikir.

9- Beyana mewlîda hedret Mihemed Mustefa: Di rista vê beşê de, ew li destpêkê rewşa gawirtiya ku li wê demê hebû diyar dike. Pişt re, salixa bûndina Mihemed û tiştên ku bi Emînê re dibûn hewaldide. Pişt re ew tê ser mirina Ebdella, jiyana Mihemedê şîrmij li ba şîrdara wî Helîma Se'dî, û çawa du kesên nûranî Mihemed birin, zikê wî vekirin, dilê wî bi avê şuştin û ji nû ve kirin cih. Û çawa piştî ji ba Helîmê vegerî û temenê wî bû şeş sal, diya wî Emîne mir, pişt re kalkê wî Ebdilmutelêb jî mir û li ba apê xwe Ebû Talêb mezin bû.

10- Beyna rîsaletê: Ev rista ya herî dirêj e di mewlîdê de. Ew bûyerên ku li dema peyama Xwedê ji Mihemed re hatiye diyar û şirove dike; Çawa peyam jê re hat, çawa jê ne hat bawerkirin, pêlanên gawiran ji bo kuştina Mihemed çilo bûn, penabirtiya wî li gel hevalriyê wî Ebû Bekir El Sidîq, bûyera şikefta Ĥerrayê... rêz dike.

11- Beyana mi'racê: Ew bûyerên ku bi çêroka Mi'racê ve girêdayî ne hewaldide.

12- Nesîĥet: Di vê ristê de li ser cîhana derewîn û vala deng dike, dibêje mirin nêzîk e, axret rast e û ne dûr e, û gerek e her kes ji bo axretê rindiyê bike û ji wê rojê re herdem amade be.

12- Du'aya mewlîda şerîf: Di vê ristê de, bergera ji bo lêborînê û qebûlkirina mewlîdê hewaldide.

13- Qesîda Kurdî: Di vê ristê de doz û pesna rêola Neqişbendî û carekê ya Qadirî jî tê kirin.

14- Çêroka kesekî baş: Ev rista çêroka mirovekî zulm lê hatiye kirin hewaldide. Ew salix dide çawa Pêxembser, Esĥabên wî û şêrê Xwedê Elî, di ber mafê wî de li dijî ew dêwê zalim radibin, lê mixabin, nivîskar çêrokê di nîvî de hîştiye û sergihayî nekiriye.

***Dr. Mihemed.E. Elî***

***Efrîn.. 19.9.2014***

# Destpêk

Mewlîda hezretî Mihemed selallahû 'eleyhî wesellem. Hebîbê Xwedê, sebeba xulqeta ezmên û erdê. Li ser zimanê me yê Kurdmancî terceme bûye.

Muelifê wê ji gundê **Gemrûkê**, koleyê Xwedê aciz **Mihemed Nezmî Xoce**.

Serwerê kaînat destpêka mexlûqat
Xudanê ayat mu'cîzat
ji Mihemed Mistefa re selewat.

# Werin Mewlîdê
# Bismîllahî reĥmanî reĥîm

Ê dixwaze ji Xwedê lutf û Îĥsanê
Were mewlîda resûlullah were were
Ê dixwaze kêf û sefaya cînanê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Şeva resûlullah bûye vê guman
Wekî leyletûll qedrê ye heman
Ger tu dixwazî ji dojehê bibî eman
Were mewlîda resûlullah were were

Ji can û dil de tu guhlêne vê nîdayê
Tev de ji nûra Xwedê ye Bavê Fatmayê
Berde kar û şuĝlê derewçîn cîhanê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Di wê meclîsa mewlîdê de bike dewam
Li ser resûl bide selat û selam
Ger li bihuştê dixwazî bilind meqam
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Dûr û nêzîk tuyê ji cîhanê barkî herê
Rêka bihuştê di ser sîratê re derê
Ger tu dixawzî vexwî ji ava kewserê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Eger tu pêgirê esĥabên sefa yî

Eger tu ji ummeta Mistefa yî
Berde kar û şuĝlê cîhana fanî
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Guhlênana mewlîdê pir sewab e
Hatiye gotin ji ĥedîs û kitab e
Ger tu dixwazî li qebrê bidî bersiv e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Were vexwe vê şefayê vê şerbetê
Bide li ser rûĥê wî yê pak selewatê
Eger tu dixwazî ji wî şefa'etê
Were mewlîda hebîbê Xwedê were were

Hev melwlûda Mihemed 'aliyê serwer e
Yarê ĝarê çar welî lê mu'teber e
Ebû Bekir, 'Umer, 'Usman û Ĥeyder e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

wilo got nebî Mihemed elmuxtar e
Kî guhlêne mewlîda min bi iftîxar e
Şefa'eta min ji wî re bi Îqrar e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Ger tu hez dikî ji Mihemed ĥebîbê Xwedê
Were guhlên vê lavayê vê mewlîdê
Meĥrûm mebe ji wê Îqbalê ji wê si'ûdê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Şeva ku bûye nebiyê mu'teber

Hemû mexlûqata gotin Ellahû ekber
Qulibîn text û taca Kîsra û Qeyser
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Çaxa mewlîda Mihemed bû aşikar
Iblîs ban gkir hawar û hawar hawar
Kûda herim li min nema sebr û qerar
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Iblîs ban gkir hawar û got werin aman
Li sêrî kom bûn tabi'ên wî Cin û Şeytan
Got Mihemed hat û li me girt rêka ezman
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Kî guhlêne mewlîda nebî sal bi sal
Xerç ke nan û ne'met û pere û mal
Şefa'eta Mihemed ji wî re ĥelal
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Şeva ku hatî cîhanê ew aşikar
Zanîn hemû ehlê kîtab û Eĥbar
Gotin heywax li ser me nema i'tîbar
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Çaxa bûye li erdê Mekkê ew silatan
Çar dîwarê Ke'bê lê silav didan
Gotin şukir em xelas bûn ji pûtan
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Eşrafên Mekkê giştik bûn meĥzûn melûl

Li hev rûniştin şor kirin bûn zelûl
Gotin dewra me çû hat dewrana Mihemed Resûl
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Giştik rabûn li kuştina wî kirin qîyam
Hemû EĤbar û Rehbanên Ĥîcaz û Şam
Ĥafiz û nasirê wî ye Rebûll enam
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Ew nebiyê axir ummet û zeman
Li cîhanê û axretê ew siltan
Jê re hatin kitab ayat û Quraan
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Ez çi bêjim li medĥa nebîyê ummetê
Ew cîhan çêbû ji nûra wê qudretê
Navê wî yê xweş kilîta deriyê bihuştê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Çiqas bêjim paşiya medĥ û pesnan netê
Ew xudanê rêka rast û şerî'etê
Eger tu dixwazî ji Xwedê hîdayetê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Ger tu bi derd î were şifa û derman
Kî tî û aşiq e, were ĥesret û hicran

Tu bibil î were baxçê gulrîĥan e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Eger tu micrim û miznib î gunehkar e
Wer mewlîda Mihemed nibîyûl mixtar e
Ji te re bibe kefaret û istîĝfar e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Ger tu dixwazî ji Xwedê siĥet se'adetê
Were vexwe vê şefayê vê şerbetê
Tuyê bibînî reĥmet feyd û bereketê
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Were were wer mewlîdê were were
Bikşîn selewat û ellahû ekber e
Li eşqa Ehmed û Mihemed û serwer e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Were ĝafil were ĥeya ew şerim bike
Dilê te bûye hişk kevir û nerim bike
Guhê xwe bi nesiĥ û penda tu germ bike
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Eger tu aşiq muĥîb î xanedan e
Were guhlên mewlîda wî bi dil û can e
Ji te re bibe ecir û sewab û iĥsan e
Were mewlîda ĥebîbê Xwedê were were

Bi qasî ava beĥr û nehra û 'ummana
Bi qasî estêrkên li rûyê ezmana
Bi qasî çilpikên berf û tûlî û barana
Selewat li ser nebî Mihemed resûlellah

Bi qasî hemû mexlûqat û însana
Bi qasî melaîkên heft qatên ezmana
Bi qasî zikr û tesbîĥ û teqdîsa wana
Selewat li ser nebî Mihemed resûlellah

Bi qasî kevir û ax û qûma li cîhanê
Bi qasî şev û roj û salên vê cîhanê
Heta bi roja ĥeşr û qîyam û waweylayê[1]
Selewat li ser nebî Mihemed resûlellah

Vê ĥesab û vê kitab û vê defter e
Vê 'eded û vê hejmar û vê qeder e
Vê destpêk vê dawî û vê rehber e
Selewat li ser nebî Mihemed resûlellah

Heta çûk û teyr dixwînin li ser dara
Heta roj hiltê li ser çiyan û zinara
Rojê heftê hezar car û car û hezar cara
Selewat li ser nebî Mihemed resûlellah

[1] واويلاه .

# Beyana qudreta Xwedê

Ya îllhî tu Xweda yî muqtedir û padîşah
Li erd û ezman  Xwedê tuneye ĝeyrî ji te ya Îlah
Ez şahîd im tu eĥedî la Îlehe Îllellah
Ez şahîd im ĥebîbê te Mihemed resûlellah
Ĥemd û şukur ji te re ya xaliqê kaînat
Li ser navê Mihemed û Mustefa selewat
Te ew xuliq kir ji nûra xwe ji rûĥê xwe yê kerîm
Te ew şandiye vê cîhanê reĥmeten lîll 'alemîn
Cîhan 'alem qet tunebû seba wî te kir îcad
Bi kef û nûnê[1] te ava kir ya Îlahî kir abad
Heft qat ezman te ava kir vê 'amûd û vê istûn
Di bin re heft qatên erda li ser ĥût û li ser nûn
erd û ezman dixemlîn Xwedê welleh vê qusûr
Bi kêra te got bisekin bi kêra te got bifitil ya ĝefûr
Ezman fitilî bi fermana te Xwedê û ya Reb erd sekinî
Te şev û roj peyda kirin yek reş û yek nûranî
Hejdeh hezar dunya 'alem ya Rebî te anîn wicûd
Şihadet dan ji yekbûna te re gotin tu yî Xweda û me'bûd
Tu qadir î tu qedîm î tu ebed î layezal
Te ne ortaq û ne ewlad û ne bira û ne heval
Hemû însan hemû ĥeywan cin û Şeytan teyr û hewam
Giştik têr in ji ne'meta te ji rizqê te ya Reb temam

[1] كاف و نون (كن).

Giş ji deriyê teyê bilind ew dixwazin ihtîda
Şah û silatan, zengîn xizan, feqîr miĥtac bay û geda
Li dergeha te giştik yek in derwîşan û xanedan
Ji mîrekî de ĥeta siltan lawê Dawûd Silêman
Emanet bi derece û bi ritbe û 'izzet î
Lê belê bi ĥeqanî tu bi 'edil û ya Reb edalet î
Giştik ji te re secdê dikin Xwedawo ya Reb bê riya
Layiqê te ye 'izz û celal, qehr û xedeb û kibriya
Zikrê te dikin dar û nebat bi ziman û vê ziman
Giş miĥtacê deriyê te ne ya reĥîm û ya reĥman
Kî bibîne zerrakî ji nûra te ya miqeddes
Ew li ĥoriya, li bihuşta li ni'meta nake hewes
Egir kevirê reş cemala te siltanî bes bibîne
Herkes wê ew kevirê reş maç ke û li ser serê xwe dîne
Li jêr û li jor tev de ĥukum û fermana te ya Reb rewan
Di pença qudreta te de hemû xuliq û hemû cîhan
Bi fermana te xudanên pûta ya Xwedê dibin sidîq
Hin ji 'erşa derdikevin dibin merdûd dibin zindîq
Hinek dibin şêx û murşid hinek dibin zahid û fadil
Hinek dibin munkir mulĥid hinek dibin fasiq cahil
Poşman û tobedara Xweda û Ellah tu qebûl dikî
Vêqerar û gunehkaran tu helak û zelûl dikî
Hinan bi reĥm û ni'meta xwe ya îlahî tu dikî xendan
Hinan jî bi ĥesret û derd û miĥneta dikî nalan
Her karekî te bi cih tê bi ferman û bi qeder
Lê nizanin mirovên bê fehim û bê nezer û bê beser

Ger dixwazin şefa'etê roja teng û roja meĥşer
Selewatan bidin li ser navê Ehmed şêrîn xeyrûl beşer
Ey baĝvanê gulzer û gulşenê baxê wê bihuştê
Ey şefî' û meded ĥebîbê vê qebîlê vê ummetê
Li roja ĥeşrê û li roja neşrê dît ehwalên qîyametê
Tu meĥrûm nekî ummeta xwe ya Mihemed ji şefa'etê
Kifir û cehaletê cîhan tev kiri bû zivistan
Di birca ĥemil de rok hilat û cîhan xweş bû nagîhan
Ew ne şems û ew ne ro bû ger dixwazin ĥeqîqetê
Temsîla şems û royê hatina nebiyê ummetê
Zivistan çû bi hatina te ya Mihemed bû buhar
Vebûn çîçek û gulên me'rîfetê aşîkar
Te peyda kir li cîhanê gulzar û him baĝên gulan
Deng li hevnan tê de xwendin tutî, qumrî û bilbilan
Van tutiyan, van qumriyan, van bilbilan kirin fîĝan
Ji şerî'eta te silatanî we'iz didan wa'izan
Rêka rast, hîdayeta açiq beyan îzhar kirin
Ehlî pûta poşman bûn tobe û istîĝfar kirin
Hinan benzê xwe avêtin û dibûn lêmûna zer
Wan ji riyadet û çîlê didan reng û didan eser
Wekî sinbila hin dibûn ustuxar û perîşan
Terg dikirin ehl û cîhan mal û milk û war û weten
Hinan cîhan berdidan û ew dibûne 'abîdan
'îbadet û ta'et kirin bi şev û roj bûn zahîdan
Bîna gulriĥana stand şerq û xerb û zêr û zeman
Senceq û bêraq kişandin Îsalam emîr û aşiqan

Micahidan li cîhanê tev de dabûn nav û şan
Xaka Şam û Rom, Îraq û Ĥîcaz standin sunniyan
Ya îlahî ya mewlayî ya Xweda û ya reĥman
Tu me jî ĥeşir kî bi wan re Xweda û ya Reb li ber mîzan
Ê ku dixwaze ji agirê dojehê bibe azad û eman
Selewata bidin li ser navê Mihemed fexrê cîhan

# Beyana qedra Nebî
# û mikalema erd û ezmên

Win guhlênin ey civata ehlî Îslam û biran
Ez ji we re bêjim qedr û qîmeta fexrê cîhan
    ta ku win zanibin qedr û qîmeta ew silatanê dîn
    Ĥebîbê kibriya xatimell enbiya û murselîn
Çaxa Xwedê miraz kir û çê kir erd û ezman
Erd nizim ezman bilind him nûranî sayî ban
    Ezman meĝrûr bû li erdê bi ĥeqaret kir nezer
    Got ey erda ĥeqîr û nizim û edna û muĥteqer[1]
Binêr li min ez çi rind im ez bilind im li banî
Xelata min şewq û feyd û bereket û nûranî
    Tu nizm î tu edna yî him jî rûyê te reş e
    Ĥeywan, însan hemû xudî can di ser te re dimeşe
Ez bûm warê melaîka cismê letîf û rûĥaniyan
Tu bû warê cismê kesîf benî Adem hemû ĥeywan
    Eger li ser te şîn dibe her ne'met û çawîr çîman
    Ji min dibare bi ser te de reĥmet û feyd û baran
Eger ji min netê ji te re berf û baran û hewa
Derya, çem, bîr û kanî li ser nabine peyda
    Li ser min roj û heyv û cewher istêrkên hûr
    Ji min datê ji te re şewq û ronî û feyd û nûr
Eger nûr û şewq û ronî ji min de ji te re netê

---

[1] ادنى ومعتبر .

Tuyê ta ebed bimînî di nav ĥecab û nav zulmetê

Li ser min in nicim û istêrkên seyyar û him sabîtat

Ji min dahatin hemû kitab û suĥuf û ayat

Eger ji min danehatiba suĥuf û ayat û kîtab

Tuyê di kifir û cehalet û delaletê[1] de bibî xerab

Ehlê min hinek qaîm e hin rakil e hin sacîd e

Ehlê te giş cahil û fasiq û 'asê û fasid e

'Erş û kursî lûĥ û qelem sirra gewre li ser min e

Qet li ser te meqamekî gewre şerîf sirrek tine

Ez bi xêr im, ez bi nûr im, ez bi dewran ĥereket im

Ez ezîz im, ez mesrûr im, ez bi feyd û bereket im

Tu bi şer î, tu bi zulmet î, tu sakin î bê ĥereket î

Tu ĥeqîr î, tu alçaq î, tu vê xêr û bereket î

Çaxa erdê bihîst ev 'etba[2] û ev xîtab û ev meqal

Pir şerm bû, pir melûl bû, pir meĥzûn bû, ziman bû lal

Erd melûl û him meĥcûb bû, him xor û him zelîl

Seke paşê çi da erdê Rebê kerîm Rebê celîl

Çaxa îradeta wî xwast miraz û teqdîr kir Xwedê

Ku ĥebîbê xwe Mihemed bi xêr were ser erdê

Ĝulĝule peyda bû li ĥeft qatên erd û ezmana

Şahî û fereĥ ketin nava melaîka û rûĥaniya

Mizgîn hate şerq û xerbê vê cîhanê sereser

Got wê dayê ser rûyê erdê Mihemed xeyrûl beşer

Bi 'izz û celala xwe bang kir Rebil 'alemîn

---

[1] الضلال.

[2] العتاب .

Got melûl mebe, meĥzûn mebe ey erda min ji te re mizgîn
Mademkî tu sikût bû û tu meĥcûb bû, tu bû melûl
Sikûta te li min xweş hat ya erda min mebe zelûl
Min ji te re 'izzetek û îkramek pir kir muyesser
Min dewlet û îqbaleka mezin ji te re kir muqedder
Qet muyesser û muqedder nebûye hîn ji kesî re
Ne ji lûĥê re, ne ji qelemê re, ne ji erş û kursî re
Ji ĥebîbê min Mihemed re tu kê bibî war û mekan
Bi ĥurmeta wî hedretî min xuliq kirin kewn û mekan
Li dergeha min, ew 'ezîz û ew meqbûl û ew muĥterem
Mebdea mexlûqê[1] min e şahê 'ezîz şahê kerem
Bo wê min xuliq kirin cîhan 'alem dewran û felek
Însan ĥeywan, ax û me'dan, cin û şeytan, pêrî melek
'Erş û kursî, erd û ezman, ar û can, şev û nihar
Ev cîhana giş ji nûra wî bû ayad û bû aşîkar
Ji nûra rûyê wî siltanî hêv û roj yek perçe ne
Ji ĥisna nûra cemala wî her du bi hev re yek şem'e ne
Li dergeha ĥebîbê Xwedê xizmet dikin bi roj û şeb
Qewlbend in, xizmetkar in, berferman in bi edeb
Ev şerefa, ev dewleta, besê te ye ya zemîn
Pir nemaye were ser te ĥebîbê min Mihemed Emîn
Wê li ser te bike ceng û ĝezwan him sefer
Wê li cîhanê peyda bike pir nîşan û pir eser
Wê li ser te secde bike derta'et û dernemaz

[1] المبدأ .

Bi ĥurmet û bi qîmet û bi ta'et û bi niyaz
Wê bi mişrik û milĥidan re bike ĥerb û ceng û ĝeza
Wê bi canê wana bike pir 'ezab û pir ceza
Wê alaya Îslamê li ser te rake û vereşîne
Dînê batil ayîna pûta tev de rake tev hilîne
Min ew şandî delîl hadî û reĥmeten lîl 'alemîn
Wê ava ke li binyata qedîm dînê mubîn
Rojê li ser te werin xwandin pênc wext nîda qamet azan
Mizgeft, mescid, tekiye, meqam wê li ser te bibin binyan
Gava ezmên dibîst hev xîtaba xweş û şêrîn
Dagirî û poşman bû, bû melûl bû ĥezîn
Ji vê xîtabê ji vê nîdayê pir melûl bû asîman
Dagirî û ew melûl bû û hêstir hati bûn baran
Ezmên tobe û istîĝfar kir dibû zar û dibû giryan
Melûl meĥcûb disekinî li şora gotî bû poşman
Paşê Xwedê bang ezmên kir ew reĥmeten lîl 'alemîn
Got ey ezmanê min ê meĝrûr, mebe melûl mebe ĥezîn
Ĥebîbê minê were rokê li te jî ew seyran be
Ew dewleta 'alî mezin rokê were li te bi mêvan be
Rokê ezê wî de'wet kim bi ĥurmet û him bi te'zîm
Wê derbas be di ser te re were ĥudûra dergahê 'ezîm
Ezman şa bû çaxa dibîst ev xîtaba ji ba sefa
Pir memûn bû bi mizgîna hatina Mihemed El Mustefa
Rabin sekin ey cema'eta muweĥid û muminan
Ew çiqasê 'ezîz û bi xatir Ehmed fexrê cîhan
Bi hatina wî siltanî, wê birhanê lo çi dibe

Ji teşrîfa wî hedretî erd û ezman ço xweş dibe
Erd û ezman, kewn û mekan ço şa dibe bi hatina wî
Em qet nizanin xatirê wî, ĥurmeta wî, qîmeta wî
Hûn jî adaa[1] bikin fermana wî, ĥedîs û him sinneta wî
Sadiqan, aşiqan herin li pê şerî'eta wî
Hûn dilê xwe pak bikin bi cîhanê mebin meĝrûr
Miĥbeta wî silatanî di dilê we de bila bide nûr
Erd bi fermana xaliqê xwe sakin bû û him razî bû
Bi dilê pak fexr û 'izzet qedr û qîmet lê zêde bû
Te çiqasî xwe nizim kir tuyê ewqasê bilind bibî
Te çiqasî xwe bilind kir tuyê ewqasê nizim bibî
Kebir û 'eceb, fexr û ĝurûr ne layiqê kolê Xwedê
Bes layiqê xellaqê cîhan ew qadirê rizqa didê
Binêr Şeytên xwe mezin dît wî merdûdê[2] xwe 'eciband
Xwedê li wî hat ĝezebê ji dergeha xwe qewitand
Meĝrûr mebe mesrûr mebe ey bêçare mirin heye
Rojê pênc caran bang te dike xebera te qet tineye
Ger dixwazin ji arê dojehê bibin necat
Li ser fexrê cîhan bibên hûn hezaran selewat
Me xwe avêt deriyê teyê 'alî bilind ya kerîm
Ji mekir û şerê Iblîs û Şeytanê le'în û recîm
Ya 'elîm û ya 'ezîm û ya xebîr û ya ĥekîm
Bi navê te yê celal û cebbar û reĥman û him reĥîm
Vê ĥedĥesab şukir ji te re ya Xwedayê 'alemîn

---

[1] اداء .
[2] المردود .

Ĥemdu lîllah ji mere dahat ayat û Quraana mubîn
Te em kirin ummeta Mihemed Ehmed xeyrûll beşer
Te em kirin ummeta ew padîşahê mu'teber
Te dînê me kamil kir û te da me ne'meta temam
Te quraana kerîm ji me re kir delîl kir îmam
Te rêka şerî'etê ya Reb ji me re kir nîzam
Te ji me re tertîb kir ferz û wacib û hemû eĥkam
Ya Rebî tu Xwedayî bê mînak û him zûll celal
Bê heval û bê şebîh û bê mîsal û bê zewal
Hemû elqab û hemû ziman li ber gotina te bûn lal
Nesix bûn hemû derew û iftîra û qîl û qal
Tu raziqê hemû mexlûq ins û cin û xas û 'am
Hemû bican û weĥş û ĥeywan mar û mor û teyr û hewam
Heft qat ezman vê amûd û vê istûn te kirin berdar
Heft qat erd li ser ba û beĥran ya Reb te kirin berqerar
Bi zimanan tu zana yî, li her waran tu hazir î
Bi her ĥala tu nazir î, li her kara tu qadir î
Sadir[1] dibin ya Reb ji me guneh û xeta û şetim
Tu xefûr î, tu reĥîm î ya Reb şana te cûd û kerem[2]
Tu ji fedlê xwe bimedî karê saliĥ û îmana kamil
Tu me nekî qewmê 'asê qewmê kahil qewmê cahil
Tu bi qismet kî ava kewser û ya Rebî Bihuştê
Em werin ĥesêb ji 'ebdê saliĥ ji 'ebdê mumin ji ummetê
Mîr û milûkên cîhanê giştik li bin fermana wî ne

1 يصدر .
2 الكرم والجود .

Kes nikane vê fermana wî kar û îşan bimeşîne
Paşiya zanîn û ĥikmet û qedra te qet netê
Eger werin gotin ta roja ĥeşir û qiyametê
Wesf û medĥa Xwedê pir vê ĥesab e paşî netê
Çiqas bibêm çiqas bibêm ewqas ji yar re zêde tê
Em wê werin ser beĥsa mewlîda Mihemed Mistefa
Selewatan li ser navê wî bidin xweş bi zewq û sefa

# Xulqeta nûra Mihemed
# silava Xwedê lê be

Ne erd hebû ne ezman û ne însan û ne ĥeywan
Ne 'erş hebû ne kursî ne lewĥ û qelem kewn û mekan
Bi tenê bû waĥêd eĥed û xellaqê cîhan
Xwast  ku zahir bike qudreta xwe bike beyan
Qismek ji nûra xwe ya 'ezîm jê kir ew Xweda
Bi wê nûrê re got ey ĥebîbî Mihemed û Eĥmeda
Ji Xwedê re twsbîĥ[1] kir ew nûra delal û bê mîsal
Bigotina riwayetê bîst û çar hezar û şeş sed sal
Paşê Xwedê ji wê nûrê re çê kir dozde perde û ĥîcab
Her perdakê tê de tesbîĥ kir ji Xwedê re vê ĥesab
Paşê ji wir biderxist û bir avête çar beĥrên mezin
Ew Xwedayê layezal û Xwedayê cîhan, ins û cin
Yek beĥra nusretê bû, yek jî beĥra merĥemetê
Yek jê beĥra 'irfanê bû, yek jî beĥra wê qudretê
Çaxa derket nûra Nebî ji wê beĥra merĥemetê
Jê bariya sed û bîst û çar hezar dilop ji qudretê
Bi emr û fermana Xwedê zûl celal û zûl îkram
Her dilopek dibû ruĥê pêxemberekî tev temam
Paşê Xwedê ji wê nûrê çê kir cewherekî biha
Xwedê navê wê cewherê ji xwe re lê danî Heba
Ji wê cewherê aşîkar bû cîhan 'alem kewn û mekan

[1] سبحانك .

Erd û ezman, erş û kursî, lewĥ û qelem, hemû bican
Paşê Xwedê awirek xweş dabû li wî cewherî
Bi fermana Xwedê ew cewhera di nîvî re dibû du cî
Li cihekî nihêrî bi awira xişm û ğedeb û heybetê
Li cihekî nihêrî bi awira xwe şefqetê û merĥemetê
Cihê yekê diĥeliya û dibû beĥr û hew dilivî
Cihê din jî ji heybeta sakin bû û qet ne livî
Ew beĥra dikeliya û bi ser ket kef û mij û dûman
Kef bû erd, mij û duman bûn heft qatên felek ezman
Ji cihê din jî çê dikir wî çar felke û çar 'alem
Yek 'erş û yek kursî bû, yek jî lewĥ û yek qelem
Paşê emr û ferman dikir padîşahê padîşah
Got binivsîne ya qelem ewel û axir ez im Ellah
Qelem melûl meĥcûb bû sekinî got ya Ellah
Cî binvîsim bi emr û fermana te ya Ellah
Got ya qelem li pêş binivîs navê min ê 'ezîm
Ew nava bismîllahî reĥmanî reĥîm
Paşê şora tu weĥîd î, la îlahe Îlla Ellah
Paşê navê ĥebîbê min Mihemed resûlullah
Qelemê got sem'en we ta'eten[1] û derĥla diçû secdê
Sed salî sakin bû qelem serî ranekir ji erdê
Ji sed salî bi şûnda qelemê qiyam kir rabû ji sicûd
Got ya Îlahî ya Rebî ya Xweda û ya me'bûd
Ya Reb zanim la îllahe Îllellah mutleq tu ye

---

[1] سمعا وطاعة .

Lê ew navê li ber navê teyê şêrîn Mihemed kî ye
Xwedê bang li qelemê dikir bi 'izz û celal û bi kerem
Got ya 'erş, got ya kursî, ya lûĥ û ya qelem
Eger tuneba ew Mihemed û Ehmed ew navê xweş
Min xuliq ne dikir erd û cîhan, 'alem, çiya û daş(kevir)
Min xuliq ne dikir kewn û mekan û cin û însan lûĥ û erş
Ji bo wî min xuliq kirin jêr û bala erd û ferş
Min xeliq ne dikir bihuşt dojeh, 'ezab, ne'îm, arê mezin
Hejde hezar cîhan 'alem seba wî min abad kirin
Çaxa ev şor û xetaya ji qelemê re kir temam
Li ser lûĥê gerî qelem dinivîsand emr û ferman
Ji ewell û ta axir li cîhanê ger çi bibe
Giştik nivîsî qelemê bi emr û fermana Xwedê
Qelem bû katib û lewĥa meĥfûz bû defter
Qeyd û bend bûn, nivîsandî bûn xêr û şer û muqedder
Hemû cîhan giştik çê bûn vê nuqsan û vê qusûr
Roj û hêv yêldiz stêrk vedibrûsîn dane nûr
Tev temam bûn qesr û qonaq tac û ritbe text û eywan
Esker- leşker, qanûn nîzam tev hazir bûn da were siltan
Çaxa Xwedê miraz kir ku hedret Adem xuliq bike
Dikir esas- bîna mezin li ser wî zatî ava bike
Emr û ferman da Cibraîl Rebê cîhan ew Xwedê
Got pençek ax wîne ji min re Cibraîlo ji dilê erdê
Perwaz kir cibraîl dahat bi fermana Xwedê Rebê letîf
Pençek ax bir ji erdê Mekkê ji ciyê gora ĥerem şerîf
Paşê ew axa Cibraîl kir bi fermana Xwedê hevîr

Reng û nûr da wê ĥeriyê ew sipî bû, bû şeb û şîr
Wekî kevirê nazik nûr da wê ĥeriyê bi ĥikmetê
Bi çêkirina îradeta Xwedê padîşahê qudretê
Ji wê ĥeriyê Adem çê kir bi gotina rîwayetê
Bir avête ber deriyê wê cînanê wê bihuştê
Cêl roj li wê derê ma ew qaliba vê ruĥ û can
Bi emr û fermana Xwedê ew xaliqê kewn û mekan
Paşê da wî Xwedê hinek ji rûhê xwe yê 'ezîz delal
Paşê da wî tertîb nîzam eĥsen teqwîm ĥusn û cemal
Paşê hat fermana Xwedê ew xaliqê çerx û felek
Got ji Adem re secdê bikin hemû rûĥ hemû melek
Melaîkan secde kirin ji Adem re ecme'în
Secde ne kir ji kebr û ĥesed Şeytan û Iblîsê le'în
Iblîs got ya Rebî te ez ji êgir anîme wicûdê
Ji Ademê axî re çima min didî sicûdê
Iblîsê le'în kibr û kîn û biĝd û 'edawet ĥesed kir
Ji hedretî Adem re bi fermana Xwedê secde ne kir
Mîrê mezin Rebê cîhanê Xwedayê reĥman û reĥîm
Ji dergeha xwe qewitand Iblîs û Şeytanê recîm
Ka bibînin fermana Xwedê paşê çi kir û çi kar kir
Di xewê de ji parsiya Adem hedreta Ĥewa çêkir
Dabû Ĥewa ĥusn û sûret bejin û qamet kemal û cemal
Bi hedretî Adem re ew kir heval û kir ĥelal
Paşê bi fermana Xwedê her du bi hev re ketine bihuştê
Bi hev re ketin kêf û zewq û sefa û ni'met û miĥbetê
Got ya Adem vir miqam û mesken û ciyê we ye

Îzna hemû ni'metê û bihuştê tev de ji we re heye
Ni'met û bihuşt tev de ji we re mubaĥ û ĥelal e
Bes ev dara ji we re qedexe û ne ĥelal e
Çaxa Adem ket bihuştê rengê wî pak bû nûranî
Nûra Mihemed Mustefa li ser pişta wî danî
Kuda dere melaîke li pê derin lê dinêrin
Hin dimeşin hin dibezin hin di ser re difirin
Wê çaxê Adem bang kir got ya Xwedê Rebê min
Ev melaîka çima dayîm têne li pê min
Got ya Adem li ser pişta te nûra Mihemed ĥebîbê min
Tev aşiqê wê nûrê ne, hemû melaîkên min
Li ser pişta te min daniye nûra nebîkî mezin
Ji bo wê nûrê melaîke li pê te dibezin
Li ser pişta te nûra Mihemed û Ehmed xeyrûl beşer
Seba wê nûrê melaîke li pişta te dikin nezer
Çaxa Ĥewa li ser pişta Adem didît nûra zelal
Got ev çi nûr e li ser pişta te ya Adem ya heval
Got nûra ĥebîbê Xwedê Mihemed El Mustefa ye
Leqeba wî xeyrûl xelq û xatem el enbiya ye
Adem û Ĥewa man li nav cînan û baxên bihuştê
Ji ĥesed re sebir û tebata Şeytanê le'în netê
Şeytan û Iblîsê le'în razî kirin Tawûs û mar
Çû ket cînan û bihuştê ew mel'ûn û ew mirdar
Ew mel'ûna wê çawa razîke Adem û bixapîne
Ji kêf û ni'meta bihuşta bilind wan derxîne
Got ya Adem cihê te yî pir bilind û pir e'la ye

Lê ji te re mirin heye vê dewam û vê beqa ye
Darek heye di bihuştê da ew dara jiyanê
Kî bixwe ji wê darê ew nabîne wê mirinê
Ger dixwazî wer te bibim ya Adem li te bimînim
Li nav baĝê bihuştê te li seyranê bigerînim
Şeytan kete pêşa Adem bir li bihuştê gerand
Got ev dara ew e, Adem li ber darê sekinand
Hedretî Adem got lawo ji vê darê ez naxwim
Ez xwe ji fermana Rebê xwe yê mezin dernaxim
Xwedê da me îzna hemû ne'metê cînan bi qerarê
Nehî kir got ji binî de nabe win bixwin ji vê darê
Hûn bixwin ji vê darê fermana me hûn bişkînin
Ezê derĥal we ji bihuşta xwe derxînim biqewtînim
Şeytanê le'în ji hedretî Adem tu îmkan û çare ne kir
Çû ba hedretî Ĥewa pesna gênim hîn zêd kir
Hedreta Hewa aqilkêm bû Iblîs ew bi înankirin da
Di wê gavê de bi wê mel'ûnê dara gênim bi xwarin da
Paşê hedreta Ĥewa jî bi Adem bi xwarin da ew nebat
(Tev jê dakevin) ji ba Xwedê de ferman hat
Çaxa ji dara gênim xwarin Ĥewa û Adem şêrîn şêrîn
Nûra Mihemed gêncê bihuştê ji ser wana bi hev re firîn
Hedretî Cibrîl ji ezman dahat bi emr û fermana Xwedê
Adem avêt diyarê Hindê Ĥewa danî axa Ceddê
Paşê Adem çû secdê û poşman bû wî dagirî
Hêstirên wî ax û kevir li rûyê erdê kirin ĥerî
Pir dagirî poşman bû, kir nalan wî kir fîĝan

Hêstirên wî hişîn kirin dar û ber û çawîr çîman
Zar û feryada hedretî Adem pir dirêj bû çû ber felek
Li hembera wî intîzar bûn hemû rûĥ û hemû melek
Derd û nalîn zar û ahîn kişandi bûn sê sed sal
Tim dagirî, bû pir poşman, kir fîĝan û nalenal
Rokê serê xwe hilanî li erş û ezman kir nezer
Li erşê dîbû gotina tewĥîdê navê Mihemed şêrîn li ber
Got ya Rebî bi ĥurmeta navê te û navê Mihemed mu'teber
Te nivîsand li erşa gewre navê xwe yê celal li ber
Ya Reb tu min miĝfêret kî bi reĥma xwe ya Ellah
Ez poşman bûm, tobe ya Reb tobe esteĝfîrûllah
Got ya Reb bi ĥurmeta ew navê xweş û pir şêrîn
Tu min xelas kî ji mekr û telama Iblîs û Şeytanê le'în
Bi ĥurmeta navê Mihemed navê xweş û pir meqbûl
Lava Adem mustecab bû tewbeta xwe dibû meqbûl
Bi fermana Xwedê ji ezmên dahat şandeyê Xwedê Cibraîl emîn
Ji Adem re anî 'af û meĝfîret û ferman û mizgîn
Cibraîlê pak û emîn memûrê weĥî û rîsaletê
Ji Adem re anî mizgîna 'af û reĥm û meĝfîretê
Got ya Adem mizgîn ji te re tu mebe meĥzûn mebe melûl
Bi hurmeta ew navê şêrîn toba te bû qebûl
Adem rabû got hezar carî ji te re şukir Xwedê û Ellah
Tu kerîm î, tu reĥîm î, tu ĝefûr î, tu padîşah
Li wê dere Ĥewa hat bîra Adem wî dagirî
Tim banê kir got ya Ĥewa, got ya Ĥewa, ew lê gerî
Pir lê giriya hedretî Adem bû melûl bû ĥezîn

Paşê hatin li çiyayê cebel 'Erefat hevdu dîn
Adem û Ĥewa her du bi hev re li ser erdê bûn sakîn
Bi wan re dibû dijmin Iblîs Şeytanê le'în
Bi fermana Xwedê Cibraîl hat her du bi hev re kirin heval
Nikeĥa wan derxistin bi hev re kirin zewc û ĥelal
Bi fermana Xwedê, bi fermana Ellah, bi fermana Rebê zûl celal
Di wê gavê de nûra Mihemed hat ser Adem bû berkemal
Dema Ĥewa bi hedretî Şîs bi fermana Xwedê bû ĥamîl
Nûra Mihemed ji Adem çû ser Ĥewa bû zail
Intîqal kir nûra nebî ji ser Adem çû ser Ĥewa
Dema Şîs bû, bi fermana Xwedê diçû ser Şîs nûril hûda
Bi vê tertîbê, bi vê nîzamê, nûra Mihemed intîqal kir
Ger çû ser kê, ew 'ezîz û ew şerîf û ew bi kemal kir
Ger çû ser kê di însên de, ew beyan û ew zahir kir
Ji mikr û telama Şeytanê le'în ew pak û ew tahir kir
Ger çû ser kê ew dilşa û xanedan û ew mesrûr kir
Di pişta Ebdela de nutfa wî ya pak zihûr kir
Ey birano li ser navê fexrê cîhan û kaînat
Hûn bibêjin sed hezar car esslam û esslat

## Hatina wicûdê
## Ebdellah bi xêr û silamet

Ji Adem de nûra Mihemed pê re hat
Çiqas pêxember hatin cîhanê ji gişan re bû xelat
    Hat gihîşte Îbrahîm û Îsma'îl ew rûĥ û nûr
    Roj ji rojê feyd û şewqa wê nûrê kir zihûr
Paşê hat û kete Al Ye'qûbê Kal Benî Ednan
Di zemanê fitretê de nûra nebî bû nîhan
    Di Kînan û Qureşiyan de nûra nebî dibû mestûr
    Di qewmê Haşmiyan de derket û bû zihûr
Wext û zeman temam bû nû Ebdella hate wicûd
Nûra nebî li ser eniya wî ciwanî dibû mewcûd
    Çaxa Ebdimutelêb dît nûra nebî aşîkar
    Li ser eniya Ebdullah bi dilşahî û bextiyar
Pir jê hezkir ji can û dil de bû aşiqê wî zarokî ye
Wî zanî bû ew zarok bi dilşahî û dewletî ye
    Xizmet û tîmara wî pir zêde kir li eman
    Can û rûĥê xwe li ber wî kir teba û kir qurban
Keç li ser wî bûne aşiq bûne meftûn
Ji ĥesreta Ebdella re giştik bûne zar û bûne meftûn
    Ehlê Mekkê hemû e'yan him zengîn û him fiqar e
    Gişan qîzên xwe didan wî vê qeleng û vê pere
Rahib û Eĥbaran kitab û defterên xwe vekirin
Reml avêtin teslîs û terbî' pişk wan çekirin

Birc û felek, yêldiz- istêrk, erd û ezman tev sekirin
Istêrka Ebdella dîn û aşkere û beyan kirin
Bi zanîna nicûm- istêrkan wî li felekan didîn
Gotin heywax bûn melûl bûn meĥcûb û bûne ĥezîn
Li hev kombûn hemû Eĥbar û Rahibên bajarê Şam
Şor û mişawir bi hev re kirin bi şerĥ û him bi nîzam
Gotin eger lawê Ebdilmutelêb netê kuştin
Li ser text û eywanan ji virûhada netê rûniştin
Heftê Rahib di şamê de bi hev re bûn cimhûr
Kîn û ĝedeb, ĥiqd û ĥesed wan girêdan der sidûr
Wan surra xwe bi hevdu re girêdan kirin raz
Bi rê ketin ew diçûne qesda lawê erdê Ĥîcaz
Di bajarê Mekkê de wan muxbîr û casûs peyda kirin
Bi şev û roj xebitîn can û mal fîda kirin
Rokê rabû Ebdella bi qesda awê bi çiyê de çû
Pê hesiyan Eĥbar û Rihban tev de rabûn ketin dû
Li nava çiyê gihîştinê qewmê zalim cîgerxwîn
Tîr kişandin şor kişandin kêr û xençer wan hesûn
Gava wana li qesda nûciwanî qesid kirin
Ne'ra Cibrîl ji jor dahat û ewna sersem sermest kirin
Ji jor de dahat melaîkê 'ezîm bi heybet û hate xar
Koma Eĥbar û Rihbanan şewitandin kir tarûmar
Wê rojê jî li awê bû yekî navê wî Weheb
Weheb dîbû ev tişta û ev macera[1] ma 'eceb

[1] ما جرى .

Dema Weheb ev kara dît bi çavê xwe aşîkar
Got Xwedê heye, Xwedê yek e, ey qadir ey qehhar
Xwedê heq kir, him îqrar kir got la îlahe îlellah
Ne xalî ye, ne 'adî ye, Xweda ye Rebê Ebdella
Dema ji awê vegerî û hate mala xwe Weheb
Çû ba Ebdilmutelêb ew bi rica û bi teleb
Got ezbenî cariyeka min heye navê wê Emîne
Ji ehlê edeb ehlê neseb ehlê 'îffet mûqîn[1] e
Lawê te jî heye navê wî xwaş Ebdella
Ger qebûl kî min Emîne daye wî bi fermana Ella
Bi emr û teqdîra Xwedê  Ebdella Emîne kir qebûl
Qîz û bûkên ehlê Mekkê tev mukedder bûn melûl
Şeva ku Emîne li Ebdella nikeĥ kirin
Ji ehlê bajarê Mekkê sê sed bûk û qîz mirin
Şevekê ji şeva Xwedê 'Ebdellah xewnek didî meger
Derdikeve ji pişta wî zincîreka ji nûra zer
Nûr dida bo vê cîhanê wê zincîrê ferş bi ferş
Serîk di pişta Ebdella de serîk çû û gihîşte 'erş
Çû xwena xwe da te'bîrê li ba mu'ebber Ebdella
Mu'ebber got tu bextiyarî lo ciwano maşela
Ji min re bêje navê te çî ye got Ebdella
Got mizgîn li te, tu bû bavê Mihemed resûlilla
Tu dilşadî tu meqbûlî law ciwano tu bextiyar
Tu sirra xwe ji her kesî re beyan meke aşîkar

[1] اهل العفة واليقين .

Bi wê mizgînê Ebdella rabû hate mala xwe heman
Jinek rastê hat, li ser wî dît 'elamet û nûr û nîşan
Navê wê salîĥeyê Fatme bû qîza Murre
Ne memlûk e, ne mekatib e, ne cariye bû, ew ĥurr e
Seyîbe bû, 'efîfe bû, paqij bû ehlî kîtab
Ehlî Tewrat, ehlî zanîn, ehlî remil û istirlab
Wê zanî bû bi zanîna reml û nicûm û bi eflak
Ku wê şevê dike were reĥma dayîkê ew nûra pak
Di wê gavê de ew nîgara bû aşiqa Ebdella
Got min bi heval ke bi vî 'evdî re Xwedê û ya Reb ya Ella
Got lawo ciwano ez aşiqa nûra te me min bibe ji xwe re
Sed hêştirên min jî hene ezê bidim heba ji te re
Ebdella got ez herim ba bavê xwe mişawer kim
Siba ezê bersivê ji te re bidim beşare kim
Got lawo ciwano ez 'efîfe me ez pak im
Eger hîşev derbas be, bi 'ehd û qirar ez te nakim
Hele binêrin li ĥikmet û fermana Xwedê û li teqdîrê
Çawa dibire fikir û mirazê însên û tedbîrê
Di wê şevê de intîqal kir ji sulba peder nitfa meqbûl
Bû mêvanê reĥma mader wê jî bir û kir qebûl
Ewqas qudretê tesaduf kir bernîşan û ber hedef
Tev li hev bûn mircanê pak, lal, yaqût durr û sedef
Ebdella rabû sibê hat ser bersiva qîza Murra
Got ez hatim ser sozê xwe taliba min ya Ĥurra
Fatmê nêrî li eniya Ebdella nûr û 'elamet wê ne dît
Got, tu ne layiqê min î ji virûhada min tu ne dît

Got, heywax li min heywax li min îqbala min qet tine bû
Ew dewlet û se'aedeta mezin ji min re qismet ne bû
Tiştê ku dilê me dixwaze xweda û ya Reb qet nabê
Herdem wekî fermana Xwedê teqdîr kirî ferman dibê
Wext û middet 'esir û zeman bûn temam, bûn kamil
Qîza Weheb bi hedretî Mihemed bû ĥamil
Melaîke li ezmanan disekinîn sef bi sef
Giştik hatin ĥemlê Emînê ziyaret kirin, kirin tewaf
Di wê salê de esĥabî fîl Ebrehe hat qesda Mekke
Hat ku rukna beyt û Ke'bê mala Xwedê xera bike
Bi fermana Xwedê teyrê Ebabîl muselet bûn hatin ser wan
Ji sicîlê kevir anîn berdan ser wan kirin bacan
Eger werin gotin hemû mu'cîzat û nîşan
Wê dirêj be kitab û çêrok û mesele û ĥîkayan
Heman li ser navê wî fexrê cîhan û fexrê kaînat
Bi eşq û ĥesret hûn bibêjin esslam û esslat
Çaxa ket reĥma Emînê Mistefa
Vê cîhanê kir hezar zewq û sefa
Çiqas firîşte hene giş sef bi sef
Bi edeb tên Emînê dikin tewaf
Çaxa bi Mistefê ew bû ĥamîle
Ew xudana exlaqa rind û kamîle
Emînê got pir 'ecayîb êş me dî
Ema ji ĥemla xwe min zeĥmet nedî
Miha pêşî hat Adem got Emînê
Bibe bi ĥemla xwe Mihemed mizgînê

Meha din hat Şîs anî mizgîn bira
Da selam got merĥeba ji ĥemla te re
Meha sisiyê hat Idrîs da selam
Got ji te re mizgîna fexrûl enam
Meha çarê hat Nûĥ wî got heman
Mizgînê kanî dêka fexrê cîhan
Meha pêncê hat Hûd 'alî sîfat
Mijde[1] da bi ĥemla fexrê kaînat
Meha şeşê hat Îbrahîm Xelîl
Got kanî mizgîn bi ĥemla te û cemîl
Meha heftê hat Îsmaîl hemîn
Mêjde dabû reĥmeten lîl 'alemîn
Meha heştê hat Mûse ba wefa
Mizgînê kanî Emîne bi Mistefa
Meha nehê hat Îsa ji esûmên
Min ji te divê ĥemla fexril murselîn
Berê were hate dîtin pir mu'cîzat
Bi eşq bi şewq bêjin selewat

[1] تمجيد .

# Mizgîn ji Emînê re

Mizgîn ji te re Emîne    ka mizgîna Ehmed wîne
Ew şefî'il muznîbîn e    mizgîn ji te re Emîne
Te hilgirt ew li Receb    va cana fîdayê we be
Ew e kaniya edeb    mizgîn ji te re Emîne
Meha tu tê de Şe'ban e    bi ĥemla fexrê cîhan e
Qedra we ya pak Xwedê zane    mizgîn ji te re Emîne
Meha sisyê Remedan e    efdelê kewn û mekan e
Mefxerê benî Ednan e    mizgîn ji te re Emîne
Şewal bû meha çarê    can û serê min li dorê
Ron bû cîhan bi nûra    mizgîn ji te re Emîne
Zull ĥice hat bi sefa    da te mizgîna Mistefa
Te bi ĥemla xwe nedî cefa    mizgîn ji te re Emîne
Muĥrremê da te xeber    bi mewlîda xeyrûll beşer
Nûr da cîhanê seranser    mizgîn ji te re Emîne
Paşê li meha Seferê    dar û ber dide xeberê
Ew serwer ekê were    mizgîn ji te re Emîne
Çaxa Rebî'il ewwel hat    te anî fexrê kaînat
Ew bû fexrê mewcûdat    mizgîn ji te re Emîne
Hat ew bû şahê kewnên    şewqa wî da erd û ezmên
Dî bi çavan qabe qewsên    mizgîn ji te re Emîne
Bû xudanê zemzem û tacê    şeva îsrayê û mi'racê
Ji ummetê re bû racî    mizgîn ji te re Emîne
Wê şevê ew gihîşt wîsalê    dît cemal û ba kemalê

Wey Xwedayê zull celalî
mizgîn ji te re Emîne
Ew e xatimê enbiya
cîhan bi nûrê bû diya
Ew e ĥebîbê kibrya
mizgîn ji te re Emîne
Ew e xudanê kewserê
ew e şefî' û rehberê
Gunehkaran li meĥşerê
mizgîn ji te re Emîne
Ebû nûr bêçar e
ze'îf û pir gunehkar e
Ji dergeha Xweda nare
mizgîn ji te re Emîne
Hezar selewat û selam
li ser rûĥ xeyrûl enam
Ser al û esĥabên kîram
mizgîn ji te re Emîne

## Beyana mewlîda hedretî Mihemed Mustefa

Ji virûhada win guhlênin, ey ixwan û ey birader
Ez ji we re bi eşq hewaldim, xweş meqal û xweş xeber
    Yê ku min bihîstî ji kitaban, ez ji we re beyan bikim
    Hatina nebî Mihemed, ez hewaldim xuyan bikim
Cîhan tev de bû bû kifir, bû bû fisq û him delalet
Giş Mecûs û giş pûtperest, giş 'asî û giş cehalet
    Di wê demê de qet tinebûn, enbiya û murselîn
    Ne kîtab hebûn ne pêxember, ne şerî'et ne beĥsa dîn
Karê wan bû kuştin û xezeb û zor û yaĝme û talan
Ne ĥukm û ĥukmet hebû, ne serok û ne siltan
    Ne Xwedê zanîn û ne pêxember, ne kitab û ne nebî
    Herkes ĥakimê nefsa xwe bû, li cîhanê ey ebbî
Cebabir û fera'înan, rêka dîn girti bûn
Dara kifir û cehaletê, li cîhanê çandi bûn
    Pût û senem çê dikirin, ji zêr û zîv û kevir û dara
    Vê re digotin ev Xwedê ye, secde kin ji wan ra
Kes bi kesî re ne rast bû, ne dilsoz û ne yar
Qetil û talana wan dikirin, bê heq û bê esbab
    Heta gihîşte dema mu'eyyen, dema axir zemanî
    Xwedê xwast ku qûl xelas ke, ji cehalet û ji 'isyanî
Xwast ku ji cîhanê rake, vê kifrê û vê zulmetê
Bi ser qûl de bibarîne, barana vê reĥmetê

Cîhan tev de bûye zulmet, kes kesekî nabîne
Xwedê xwast ku li cîhanê çiraka ji nûrê vêxîne
Ew roja herkes rêka rast, li pêşiya xwe bibîne
Rind û xerab, ĥelal ĥeram, emr û eĥkam têbigihîne
Bi rûĥ û nûra Mihemed Mistefa re got Ellah
Li cîhan û li axretê min tu kirî siltan û şah
Min tu kirî şah û ĥakim him siltan û pêxember
Tu siltanî tu îmamî tu delîl û tu rehber
Min tu xulq kir, min tu mezin kir, ya Mihemed min tu xwast
Here veke rêk û rêça şerî'etê rêka rast
Rûĥê Ehmed çaxa dibihîst ev nîda û ev xîtab
Bi te'zîm û bi edeb dabû Xwedê ev cewab
Got ya Rebî min emr û fermana te kir qebûl
Tu qadir î, tu me'bûd î, ez im ji te re kole û qûl
Ey Xwedayê mino ya Reb ya kerîm û zûl celal
Ez mutî'ê fermana te me li fermana te min kir imtîsal
Ez dixwazim nîşanekê tu ji min re beyan bikî
Rîsaleta min bi wê nîşanê ya Reb tu xuyan bikî
Xwedê bang wî rûĥî kir got, ey nûra min delal
Ez qadir im muqtedr im, ez qedîr im pir kemal
Tu çi dixwazî bixwaze, ezî tuwana û qadir im
Tu çi çaxê bixwazî ez amade û tim hazir im
Ey nûra min ezkê bidim kitab û quraana mubîn
Ji te re dînim bi zanîna melekê ezîm Cibrîlê emîn
Wê ji te xuya bibin pir 'ecayêb û mu'cîzat
Wê ji te re werin pir 'elamat pir ayat û beyyinat

Eger hûn dixwazin ji arê dojehê bibin necat
Bidin li ser rûĥê Mihemed Mistefa selewat
Werin guhlênin ey îxwan hûn bi zewiq û sefa
Mewlîda xweş ĥebîbê Xwedê Mihemed El Mustefa
Hele çawa hat vê cîhanê ew Mihemed ew resûl
Ço teşrîf kir ĥebîbê Xwedê xeyrûl beşer nûra meqbûl
Cîhan stand şerî'et û ĥukum û ferman û nûra wî
Qûl xelas bû ji zulmetê ji cehaletê bi hatina wî
Dema ĥemlê qîza Weheb nihe mihe bûne temam
Hate dema ew ji cî rabe ew dewleta xeyrûl enam[1]
Hat şeva danzde Rebî'll Ewwelê
Di sala teng û sala qeĥt û sala bela û ĝelê
Şeva ku wê were cîhanê nûra Xwedê xeyrûl beşer
Emînê didîn pir 'ecayêb pir ĝerayêb pir huner
Wê got berî nûrek mezin ji ser min rabû min didî
Ji meĝrib û heta meşriq tevde bûye ronî
Bi fermana Xwedê ferşa nûrê li ezmana belav bû
Deriyê heft qat 'erş û ezman giştik bi hev re vebûn
Wekî rojê aşkere bû ew şeva reş û tarî
Ji beĥra feydê reĥma Xwedê bi ser qûl de dibarî
Got min dît ji ezmên de dahatin sê al û sê bêraq
Ne Şamî bûn, ne Romî bûn, ne Ĥîcazî bûn ne Îraq
Qudretî bûn, ĥîkmetî bûn, reĥmetî bûn nûranî
Sibĥanî bûn, rûĥanî bûn, feydanî bûn nûranî

[1] خير الانام .

Yek li meşriq yek li muĝrib li asoyê bilind bû
Yek jî li ser bajarê Mekkê sekinî û perlemîş bû
Çaxa nîşan û 'elameta li min kirin beyan û zihûr
Min zanî dike were cîhanê bi fermana Xwedê Mihemed nûr
Bi tirs û lerze rûnişti bûm der'eceb û ez ĥeyran
Çar dîwarên xêni vebûn ji nişkave der zeman
Jê derketin pir xatûn û ĥoriyên wê bihuştê
Hatin dane min mizgîna nebiyê vê ummetê
Di pê wan re çar jin hatin belê bi ĥusn û bi cemal
Her yek di ser yekê re bû bi edeb û bi kemal
Her çar hatin wan bi hev re didan min xweş selam
Bi min re gotin xwaziya me bi ĥalê te yê xweş kelam
Yek Ĥewa bû bi fermana Xwedê yek mumine Asiye
Yek Sara bû bi fermana Xwedê yek Meryema 'Umraniye
Wan li mala min rêxistin ferş û ĥerîrê bihuştê
Bendewar bûn li hatina Mihemed nebiyê ummetê
Paşê wan bi xwe dane dest min yek şerbet û yek qedeĥ
Bi min re gotin vê şerbetê vexwe wê were ser te fereĥ
Min jê vexwar sipî wek şîr û ji hinguv şêrîntir
Te'mek da min ne hinguv wiha bû ne şêranî û ne şekir
Çaxa min vexwar ew şerbeta aqilê min çû wekî serxoş
Ez gêj bûm aqil nema mam bê ĥal ez bûm bê hiş
Pir nema aqil hat û şiyar bûm ez heman
Têrekî sipî hate mala min derĥal û derzeman
Govdê wê, perbalê wê giştik wekî teyra bû
Ser û soret ĥisn û cemal tev de wekî qîzan bû

Bi erkan û bi edeb hat û rûnişt li tenişta min
Got bismilleh û destê xwe yê mubarek danî ser pişta min
Gava dest û perê xwe ji ser min rakir wê hilanî
Godikê min Mihemed bû, nûrê hundur giş hilanî
Rabin ser xwe ey cema'et ey guhdarano bikin qiyam
Berê xwe bidin erdê Ĥîcaz Mekkê û Medînê Beytûl Ĥeram
Ji can û dil de hûn bibêjin esslat û selam
Li ser fexrê kaînata ew siltanê her du cîhan
Çaxa diket li erdê canê mubarek mucteba
Hemû melaîke û erwaĥan vê re gotin merĥeba
Kevir, daran, çiya û zinaran gişan gotin mrĥeba
Çûk û têran mor û maran tevde gotin merĥeba
Melaîk û rûĥaniyan bi hev re gotin merĥeba
Kaînatan, mewcûdatan tev de gotin merĥeba
Ey îxwan win jî bêjin merĥeba û merĥeba
Tu bi xêr hatî nûra çavan, ĥêla çokan merĥeba
Merĥeba ji te re şahê cîhanê, siltanê siltanan merĥeba
Merĥeba ji te re ya ĥekîmê derd û dermanan merĥeba
Li ser navê fexrê cîhan Ehmed fexrê kaînat
Hûn bibêjin sed hezaran esslam û esselat
Mewlîda Mihemed bi xêr û selamet me derbas kir
Nûra mubarek derĥal çû ser xudanê xwe ew nas kir
Ew[1] Xwedayê layezal û bê mîsal û kir dikar
Mora nibûwwetê di wê gavê de li ser pişta wî kir aşîkar
Çaxa diket li ser erdê canê pak û him nezîf

1 هو الله لايزال وليس له مثال وصاحب الذكر.

Derĥal hat û li ber lingê wî kir secde Ke'ba şerîf
Derĥal wî jî secde kir ji Xwedê re wê gavê
Got ya Reb tu bidî xatirê min Xwedêwo vê ummetê
Eywana Kîsra û Qeyser wê şevê her du bûn xirab
gelek dêr û kinîse wê şevê bûn ax û tirab
Beĥra sawe çikiya û bi erdê de ew çû xwar
Arê arperestan mir, tevde bû axa sar
Eger çiqas hebûn milûk û padîşah û ĥukumdar
Text û  tacên gişan qulubîn ji texta de hatin xwar
Ji çar dîwarê Ke'bê hatin çar nîda û çar seda[1]
Yê yekê got a ĥeq hat û a batil çû bû wenda
Yê din got vebû deriyê feyd û nûr û wê reĥmetê
Hate girtin deriyê kifir û cehl, zulm û delaletê
Yê din got mizgîna min ji te re be ya Mekke
Lawê Emînê hat deriyê xêr û reĥmetê li te veke
Yê din got ya Mihemed ya Ehmed û ya Emîn
Tu zanibe muttleq min tu kir reĥmeten lîl 'alemîn
Mihemedo tu li cîhanê reĥmeten lîl 'alemîn
Law Ehmedo li axretê tu şefî' el muznîbîn
Melaîka defa mewlîdê ji Ehmed re lêxistin
Şeytanê le'în ji ezmana qewitandin derxistin
Eger hebûn li darê erdê çiqas geya û darûber
Ton bi ton dan wan çîçekên sor û sipî kesk û zer
Qasî Ke'be kêfxwaş bû û dilxwaş bû ew şa bû

---

[1] صدى.

Ĥereket hat bi fermana Xwedê ji cî hilbû ji cî rabû
Çiqas nexwaş derd lê hebûn wê şevê giş bûne saĝ
Li dilê Şeytên ketin derb û xem û keder û şewat û daĝ
Nîşan û 'ecaîbên wê şevê giştik nabin nîzam
Çiqas bibêm çiqas bibêm dîsa giştik nabin temam
Dema bû ji diya xwe kurkê pak û bi şahiyet e
Dîtin berê navik biriye ew bi xitan û sinet e
Melaîkên ezmên hatin disekinîn sef bi sef
Godikê Emînê tebrîk kirin ziyaret kirin, kirin tewaf
Bi fermana Xwedê ridwana deriyê bihuştê vekirin
Ton bi ton çîçekên bînxweş anîn û bi ser werkirin
Dihatin ziyareta wî hemû Ĥorî hemû ĝulman
Çav û rûyê xwe di dest û lingê ewê pîroz didan
Sê roj û sê şevan bi fermana Xwedê ew dikirin xilwetê
Ĥorî û melaîke tenê têne tewaf û ziyaretê
Çiqas Ĥorî û melek hebûn giştik hatin tewaf kirin
Bi dest hev de digerandin yek bi yek çav lê kirin
Ji sê rojan û şûnde bavê kal rabû wî qiyam kir
Li bajarê Mekkê de'wetek mezin wî beyan û wî xuya kir
Xelat û name belav kirin, kirin tidareka diyafetê
Ebdella şande bajarê Şamê bi karwan û ticaretê
Got Ebdella tu bilezîne du qonaqa yek hilîne
Her tiştê gerek wîne, tu zû were xwe bi me gihîne
Bi dilê min ez de'wetek pir mezin û bi xêr bikim
Hemû zengîn û fiqarên bajarê Mekkê gişan têr bikim
Ebdella çû û bi rêket tewlên ĥêştiran qetir kirin

Ebdilmutelêb 'Eşîret û qewmê xerîb bi xêr kirin
Ne got zengîn ne xizan bi fermana Xwedê de'wet 'am kir
Def lê ketin xwendî hatin her tiştê xwe temam kir
Tu here emr û karê Xwedê wî çi ĥukum û çi afat kir
Xeber hat ku Ebdella li rêka Şamê  wî wefat kir
Em yê Xwedê ne û em jê re ya Reb racî'ûûn
De'wet diyafet û wefat giştik bi hev re temam bûn
Sê roj tenê Emînê mêjand û ji xwe re kir tîmar
Ji sê roja tenê Ĥelîme Se'dî  anîn kirin şîrdar
Pir şîrdar berî anîn nemêti bû wî sulatanî
Bi fermana Xwedê şîrê Helîmê wî mêt ew lê banî
Ew Ĥelîme ji Medînê bû jina Ĥariss vê guman
Salîĥe bû pakîze bû ew ji qewmê Se'diyan
Lawekî wê hebû navê wî Demre bû pir neĥîf
Şîr tine bû ji birçîna pir nexwaş bû pir ze'îf
Qeĥt û ĝelê cîhan tev de kiri bû feqîr û derwîşan
Giş birçî bûn giş sêfîl bûn giş pirsker bûn perîşan
Ĥariss digot ya Ĥelîme rabe em jî herin Mekkê
Belkî Xwedê deriyê xêrê deriyê rizqa li me vekê
Ĥelîmê got ya Ĥarisso em herin Mekkê çi karî bikin
Şîr jî tine ger em herin ji xwe re şîrdarî bikin
Bi wê fikrê bi wê xemê Ĥelîme û Ĥariss ketin xewê
Tu were ĥukm û emr û teqdîr û fermana Ellah Xwedê
Tu kerîm î, tu reĥîm î Xwedêwo Ellah tu cebar
Di xewê de wê Ĥelîmê giyak xwar û avek vexwar
Ji xewê rabû ew Ĥelîme ji xweberê têr û tijî

Ji her du berên wê xatûnê şîrê sipî dirijî
Ĥelîme rabû got ya Ĥariss hele rabe ev çi bû
Her du berên min kaniya şîrê sipî lê vebû
Sibê rabûn Ĥelîme û Ĥariss her du bi hev re bûn rewan
Rêka Mekkê girtin çûn tev qafîlê tev kewran
Hêdî hêdî bi hev re dimeşîn ew diçûn
Saĝ selamet ew her du derbas bajarê Mekkê bûn
Çûn rûniştin li bazara şîrdara rê nirîn
Kes ne pirsî li ĥalê wan, bûn melûl û bûn ĥezîn
Ebdilmutelêb hat bazara şîrdara Ĥelîme dî
Sîma pak, 'efîfnak, hem şîrpir nûranî
Vê re digot navê te bi xêr çî ye ya ĥerîme
Got xêra Xwedê li ser te be bavo navê min Ĥelîme
Got ya Ĥelîme li ba min heye zarokî pak û hem kerîm
Lê ew vê peder e ya Ĥelîme ew yetîm
Çûne mala xanedana ew Ĥariss û Ĥelîme
Çûn sekirin ĥebîbê Xwedê zarokê pak û yetîm e
Ĥelîme digot ya Emîne navê lawê te çî ye
Got navê lawê min Mihemed ya Ĥelîme Se'dîye
Got ya Emîne pîroz be navê lawê te xweş e
Ezê bibim herim ji te re bimêjînim wî belaş e
Ĥariss digot ya Ĥelîme rabe here ew çi xeber
Tu kê çi kî bi vî sêwiyê bê bavik û bê peder
Çaxa Ĥariss hana got û li Ĥelîmê xwar nêrî
Hêstir berdan her du çavên wê Ĥelîmê dagirî
Got ya Ĥariss aman aman were li min wilo meke

Destê min û va cewherî va ne'metî ji hev meke
Ez aşiq im, ez ĥeyran im, aman Ĥariss li wî
Can û rûĥê min fîda ye kurê apê li ber wî
Wekî wî zarokî li cîhanê min qet ne dîtin
Nûranî ye, nûra Xwedê li ser wî ye, pir şêrîn
Ĥariss dil kir, Ĥelîme rabû godik rakir hilanî
Çav maç kirin, got ez qurbano ez ĥeyrano tu canî
Mihemed birin Ĥelîme û Ĥariss her du bi hev re birêketin
Emîn û Ebdilmutelêb rabûn bi hev re bi pê ketin
Pir dagirî wê Emînê got ya Mihemed wey li min
Tu emaneta Xwedê bî roniya her du çavên min
Got tu bi xêr û selamet herî ya Ĥelîme xêr li te be
Xêr û gunehên Mihemedê min ê biçûk li ustiyê te be
Bi rêketin Ĥelîme û Ĥariss bi hev re bûne rewan
Hêdî hêdî gihîştin bajarê Medînê bi eman
Mirazê dilê Ĥelîmê bû godikê xwe bir bi xwe ra
Zad û xwarin jê re hatin ji mala mezin bi bara
Ĥelîme û Ĥariss her du bûn xedamê ew zarokê bi nûr
Li xizmet û li tîmara wî mehbûbî nakin qusûr
Berê Ĥelîmê yê rastê ew dimije
Eger têr be eger birçî be berê çepê qet namije
Hele sekin ev çi nîşan 'elamet û mu'cîze ye
Çunkî zanî şîrbirayê wî lawê Ĥelîmê Demre heye
Çaxa şîva Ĥelîmê rokê berx û pezê xwe dimêjand
Wî me'sûmî didagirî hêvê dergûşa wî dihejand
Rû melûl bû bi ĥesret bankir ya Xwedê û mîrê mezin

Ew xizmeta, ew dewleta, ya Xwedê çima te ne da min
Bi ya Xwedê mezin dibû rojê bi qasî mehakê
Meha wî bi salekê bû, si'eta wî bi ĥeftakê
Qet bi çoka nemeşî û bi çarlepa ew ne xuşî
Yek salî heman rabû bi carekê ew dimeşî
wekî lawika ew nemeşî hêdî hêdî û hin bi hin
Rûĥ û canê min û roniya her du nezer û çavên min
Çaxa ji hundur derket hate derve nûr û cewher
Roj û hêv her du sekinîn li wî zarokî kirin nezer
Şora yekê ji devê wî derket got ya Xwedê
Gotina yekirinê digot ew jî Xwedê tunene ji bilî Xwedê
Çi bigota şora wî rast û doĝri û seĥîĥ
Zimanê wî pir şêrîn bû pir belîĝ bû pir fesîĥ
Em canê xwe li eşqa wî li rêka wî bi qurban kin
Bi şev û ro, bi leyl û nihar em selat û selam kin
Rokê wî bi helîmê re got: Dayê kanî hevalê min
Kûda dere ez qet nabînim ew Demre şîrbirayê min
Ĥelîmê got, ez ĥeyrano, ez qurbano lo tu nizane
Birayê te dere ber pêz qurbano ew şivan e
Got dayê ev ne însaf e, ne wicdan û ne tu ĥal e
Ew li sermê, ew li germê, ez jî rûnim bi kêf li mal e
Ew bigere li çiya û cîbal li deşt û çolan û newal
Tim bibeze, tim bilîze mîna xezal
Ez sibê ji xewê rabim ji birayê xwe namînim
Ez jî herim bibim şivan pêz bi wî re biçêrînim
Sibê rabû ço hilanî bi Demre re dibû heval

Pez belav bû xweş çêriya bû, deng li hev nan bû kalkal
Şêrek derket ji nav çiyê û hat qesda wî pezî
Serê şivanê çûçik dît û bervê hat her dibezî
Wî şêr girt û di guhan de şorek didu kir
Eger vê re çi goti bû Demre ne bihîst, fêm ne kir
Şêr dûvê xwe li ba kir û çû winda bû ber cîbal
Pez belav bû vê tirs û xem li pir gelî û pir newal
Rokê Demre kevirek çekir lingê mîka wî şikand
Wî mî girt û destê xwe yê mubarek bi ser de kişand
Bi fermana Xwedê lingê miyê çê bû rabû bezî derĥal
Demre ban kir got ya maşela ez heyranê destê delal
Rokê Demre hate mal û dema nîvro kir hawar
Got aman rabin birayê min birin kir gazî û zarezar
Ĥelîme rabû got law nemawo ev çi xeber û çi meqal
Ĥêla çoka min şikiya benda dilê min qetiya ev çi ĥal
Got dayê cotek mirov hatin wan birayê min birin
Ez nizanim birin kuştin ez nizanim çi kirin
Ĥelîme rabû got aman rabin wey Mihemed wey li min
Qebîla Se'diyan tev de rabûn kesek nema mêr û jin
Giştik rabûn kirin zar û kirin feryad û waweyla
Gotin ya Reb tu xelas kî şivanê biçûk ji bela
Ĥelîmê ban kir got aman zû kin ya qebîla Se'diya
Emê çi bersivê bidin li ber qebîla Qureşiya
Ĥelîme pêşde bezî çû û ew gihîşt nava çiyê
Dît perçak nûr ji ezmên dadiket ser erdê
Bi tirs û lerze Ĥelîme berve wê nûrê çû

Di nav wê nûrê de, şivanê biçûk Mihemed jê ve xuya bû
Got wey Mihemed, wey Mihemed ez ĥeyrano canê min
Aman çi bû, çi hat ser te ez qurbano wey li min
Serî rakir, got ez qurbano li ser kaba xwe danî
Ramûsa bû çavên bi nûr her du çavên nûranî
Got ya Mihemed ya Mihemed banê kir û dagirî
Bi dengê wê re çav rakirin wî siltanî lê nêrî
Got aman çeger, ev çi kar e, ev çi bela ev çi ĥal
Beyan bike tu ji min re nûr û ceger ey delal
Got ez girtim anîm vira cotek merî bi cemal
Rûĥanî bûn, nûranî bûn her du ji nûra layezal[1]
Yekî destê min girt û yekî jî kêr da zikê min
Biderxistin dil û ceger hemû endamên dilê min
Teşt û misîn anîn her du li benda hevdu rûniştin
Bi bêna xweş û ava gulan dil û cegera min şûştin
Paşê dîsa qelb û dilê mi rakirin danîn cî
Rabûm serxwe, dora xwe nêrî, dayê kesek min nedî
Ew hilgirt Ĥelîma Se'dî bi tirs û lerz anî mal
Qewmê Se'diyan kom bûn hatin gotin pir meqal
Hinan gotin karê tirsê, karê cinan û pêriyan e
Hinan gotin karê siĥra kahinan û caziya ne
Gotin mesekin rabe serxwe ya Ĥelîme Se'diyan e
Bibe here ba cindar û kahinekî pê zane
Ĥelîmê rabû ew rakir û li rêka dêrê bû rewan

---

[1] لايزال .

Bir ba kahin tiştê bûye wekî bûye kir beyan
Kahin digot ya Ĥelîme navê lawê te çi ye
Got navê lawê min Mihemedê Qureşî ye
Çaxa kahin ji Ĥelîmê ev şora bihîst ji cî rabû
Esera qeĥir û xedebê li rûyê wî mel'ûnî peyda bû
Wî carek din li rûyê wî me'sûmî bi kûranî kir nezer
Mirûz tirş kir wî zilamî, ew ji dêrê derket der
Got ey kahinan, qewmê pûtan qewmê esnam rahiban
Li ser vî zarokî min dîne pir 'elamet pir nîşan
Li min hatî tirs û lerze, xof û xişyet û xelel[1]
Ez ditirsim ev zaroka batil bike dînê Hubel
Got giştik rabin em vî zarokî winda bikin vê eman
Bi Lat û 'Izze Mihemed ev e, pêxemberê axir zeman
Zikra navê Mihemedê şêrîn ew meĝdûb û mest kirin
Şûr rakirin li zarokê sêwî wan zaliman qesd kirin
Di wê çaxê de li wir peyda bû pehlewanek derĥudûr
Bi xişm û heybet destek rum û destek şûr
Wî şûr rakir qîrî kişand bi navê celal navê pak
Arek derket ji şûrê wî kahin giştik bûn helak
Xof û lerze hate Ĥelîmê got aman ya Reb ya sittar
Tu ĥefîzî, tu letîfî, tu celal î, tu cebbar
Mihemed rakir derket ji dêrê bi lez û bez ew revîn
Geh bezî û geh meşî û bi şûn xwe de dinêrî
Bi wê tirsê, bi wî ĥalî Ĥelîma Se'dî ji dêrê tê

---

[1] الخوف والخشية والخلل .

Dît ku jinek li ser rêkê sekiniye ban dikê
Dibêje heywex, dibêje aman, dike gazî û hawar
Dibêje di bîrê werbû cegera min avê xwar
Çaxa Mihemed bihîst hawar û waweyla wê pîrê
Bezî hat û sekinî li ser devê wê bîrê
Bi pêçiya xwe ya mubarek îşaret da avê
Av ji binê bîrê rabû hate ser devê wê kaniyê
Me'sûm ji avê derket rabû ser xwe kir qiyam
Got Xwedê yek e tu heq pêxemberê Xwedê ya
Mihemed ya îmam
Ew me'sûmê vê ziman û vê lîsan û vê kelam
Şihadeta xwe hilanî bi fermana Xwedê kir nîzam
Xwedê heye, Xwedê yek e, la îlahe îllellah
Heq pêxember, heq nebî ye Mihemed resûlullah
Ĥelîme hat û bi selamet gihîşt mala xwe heman
Ĥal û eĥwal ji qewmê Se'dî gişan re kir beyan
Ĥariss ban kir ya Ĥelîme el eman el eman
Tu vî me'sûmî bibe here ji xudiyan re bi eman
Got ya Ĥelîme Qureşî malek mezin xanedan in
Kî vê re dost e kî dijmin e ya Ĥelîme em nizanin
Bi ĥurmeta vî me'sûmî em xelas bûn ji xela
Bibe here ji xudyan re ez ditirsim ji bela
Ĥelîme rabû sibeda ban kir got ya Mihemed ya ĥebîb
Rabe em herin ba bavê kal, kalê te Ebdilmutelêb
Li qesda Mekkê Ĥelîme rabû li merkebê bû siwar
Li pêş xwe kir zarokê sêwî ew Mihemedê navdar

Qewmê Se'diyan giştik hatin bi ĥesret û bi hawar
Gotin heywax Mihemed here emê çawa bikin wey hawar
Qewmê Se'diyan giş hatin li ser wî kirin şîn
Waweyla û feryad kirin dane girî kirin hîn
Giştik hatin çav û serê wî me'sûmî ramûsandin
Di dest hev digerandin bên dikirin wek rîhan
Ĥelîme rabû bi kerûnira ew bi rê ket kir sefer
Bi rêda didîn pir 'ecayîb pir ĝerayib pir huner
Çaxa gihîşte erdê Mekkê ew Ĥelîme bi sirûr
Ji xeybê de sê deng hatin banê kirin wan ji dûr
Dengê yekê, zulmet çû ya Reb şukir rehmet hat
Dînê bedîl ayîna pûtan ji dinê rabû ew hilat
Dengê diduyê got mizgîna min li te be ya Mekke
Hindik maye Xwedê deriyê nûr û xêrê li te veke
Dengê sisyê got ya Mekke tu bû menzîla rûĥaniyan
Ta roja qoyametê tu bû rikna ĥeciyan
Çaxa Ĥelîmê bihîst ev deng û ev xîtab û ev seda
Got 'eceb kî ye, kî ban dike xwda ya Reb ev nîda
Ew sekinî li dora xwe nêrî got 'eceb kî ye kî heye
Carekê sekir zarokê sêwî Mihemed li piştê tuneye
Got heywax li min ez kûr bibim wê kir zar û dagirî
Got ya Mihemed ya Mihemed wê ban kir û girî
Li nav Mekkê bû munadî ew Ĥelîme bû dellal
Bi ah û fîxan, zar û feryad girî kir nalenal
Pîrjinek rastê hat û Ĥelîme dît bi fîxan
Got ya Ĥelîme derd û ĥalê te çi ye ji min re bike tu beyan

Got aman pîrê ez çi bêjim ez nemînim min çi kir
Min lawê xwe li ber bajarê Mekkê aman hinda kir
Got megrî keça min, ez te bibim pêşiya 'Izza û senem
Lat û 'Izza xeybê zanin ew me'bûdê pir kerem
Gelek caran windabûyî wî me'bûdî peyda kirin
Pir ĥeyran û sergerdanî wekî te wî şa kirin
Pîrê Ĥelîme bir çû pêşiya Lat û 'Izza pût senem
Secde dikir pîra cazî li ber me'bûdê bê kerem
Got ya me'bûd lawê Ĥelîme winda bûye ji te meded
Nav û ismê wî me'sûmî ya pûto Mihemed
Çaxa pîrê navê Mihemed bi bîr anî û kir beyan
Sernekûn bû pût û senem kete erdê derzeman
Got rabe pîrê ji vê derê ev çi şor û gotin
Hatina wî Mihemedî qesda nesx û 'ezla min
Sernekûn in, şermezar in, rûreş in em ji wî
Em meĥcûb in, em zelîl in, em ze'îf in li ber wî
Zemanê me çû li me nema şeref 'izzet i'tîbar
Hat zemanê qetl û xesba ehlê cahil û him kuffar
Ez nizanim 'ilmê xeybê ez rûreş im ez meĥcûb
Xaliqê 'alemê xeybê zane ew 'ellam el ĝuyûb
Tirs û heybet li wê derê hate pîra por sipî
Ji dêrê derket, ket û rabû, ew şaş bû ew revî
Ĥelîmê got wey lê pîrê ev çi kar û ĥikmet e
Ev çi ĥal e, ev çi ton e, ez dibûme ĥeyret e
Ehmedê min çû winda bû ji kê bibim ez xeber
Ez nizanim 'eceb xweş e lê miriye ev ceger

Ĥelîme gerî li nav Mekkê koşe koşe der bi der
Mihemed ne dî, wê ji kesî ne bir mizgîn û xeber
Bi zar û giryan xeber dabû kalkê wî Ebdilmutelêb
Got wey Helîmê ev çi kar e û çi xeber ez xerîb
Wey li min be ruĥ û can wey 'ezîz û wey ĥebîb
Ez 'aciz im, ez bi xem im, mukedder im, mudterêb[1]
Bi zar û giryan ew hat li ber Ke'bê sekinî
Got tu 'elîmî, tu kerîm î ya Reb Ehmedê min kanî
Li min bimîne Xwedê û ya Reb tu dîdara wî yetîm
Ey xwedawo tu qadir, tu nazir, tu kerîm
Bi heqê zat û 'izzeta xwe ya Xwedê û ya Ellah
Ew li kû ye tu ji min re beyan bike ah û ah
Deng û nîda hat ji xeybê banê kirin ji hatif
Got here kalo Ehmedê te yî li tuhama şerîf
Çû Tuhama yek dîbû li bin dara şecer yemam
Got tu kî yî navê xwe bide ji min re ey xulam
Got ez Ehmed û Mihemed im torinê Ebdilmutelêb
Tu kî yî, tu jî xwe ji min re beyan bike ey ĥebîb
Got were bavo ez heyrano kalê te me ruĥ û can
Law ruĥê mino, dilê mino, serê mino ez qurban
Ebdilmutelêb ew hilgirt û bi şahî û şabûn hate mal
Got ya Reb şukur tu qadir î, tu kerîm î, zûll celal
Emînê got merheba ceger dilo merheba
Tu bi xêr hat ruĥ û cano, roniya çavano merĥeba

---

[1] مكدر ومضطرب .

Ĥelîmê got ya xwdawo, ya îlaho, ya Reb şukir
Ĥemdû lîllah te dît li kû mirazê min 'ebdê kir
Her du nûr û her du cewher bûne cot û bûne yek
Ustûnê nûrê ji ser wan rabû çû ber 'ezmên ber felek
Ebdilmutelêb kalê Mihemed, pîrê şerîf û xanedan
Ĥelîme bi rê kir bi hediya bi baxşîşên pir giran
Çaxa temenê wî bû şeş sal bi fermana Xwedê pakîzat
Diya wî jî çû beqayê, ji cîhanê kir wefat
Ger dixwazin ji agirê dojehê hûn necat
Li ser navê Mihemed bidin dem bi dem selewat
Şukur ya Reb ya rehman û ya reĥîm û ya kerîma
Ĥebîbê te bû siltanê enbiya û yetîma
Melaîkên ezmên rabûn, gotin ya Reb ya kerîm
Ne ĥebîbê te Mihemed li ser erdê ma yetîm
Xwedê ban kir got ya ĥizbê melaîk û rûĥaniyan
Ez xebîr im, ez beşîr im, ez 'elîm im muste'an
Ez qadir im, muqtedr im, li her tiştî qadir im
Li ser hemû eĥwalê wê ez ĥazir û nazir im
Ez dibîsim, ez dibînim, ez dizanim û mubînim
Hemû ĥal û eĥwalên wî melaîkno ez dibînim
Pir nemaye ez xelatekê ji wî re bişînim
Nav û şanê wî sulatanî bilind bikim û hilînim
Kalê wî ew mizin kir, bi naz û delal û bi îkram
Pir nema bû dora wî jî vegerî û bû temam
'Adeta cîhanê ev e, bê wefa û bê îman
Ji kesî re namîne, û nabe milk û nabe mekan

Ton bo ton hatin dadwer, hatin zalim û siltan
Kanî Mihemed, kanî Iskender, kanî siltan Silêman
Dema Ebdilmutelêb ji cîhanê kir irtîĥal
Sal û temenê wî 'ezîzî û wî şerîfî temam bû heştê sal
Çaxa Ebdilmutelêb ket ĥalê bermirinê û sekeratê
Got vir de were ya Ebû Talêb ez bi te dim tenbîhatê
Ebû Talib hat li ber wî dagirî û çok vedan
Got bavo ji fermana te re can û serî min fîda
Got ey lawê min Ebû Talêb wesiyeta min li ba te be
Ehmedê min di pê min re emanet be li ba te be
Xêr û gunehê wî sêwî li cîhanê li ustuyê te be
Ez dixwazim çavê wî bi hêstira qet şil nebe
Ew cewher û cewherekî pir bi qîmet û pir buha ye
Ey lawê min zani be ku ev xatim el enbiya ye
Ev zarokê pir tahir hem pak û temîz
Ji rukna bilind û ji nesla 'alî ji qebîla şerîf
Li ser emir û wesiyeta Ebdilmutelêb bavê kal
Ebû Talib ew me'sûm li pişta xwe kir bire mal
Ebû Talib bir ba xwe zarokê pak û hem bi nûr
Li xizmet û tîmara wî ne dikir qet ti qusûr
Bi naz û niyaz mezin bû ji Xwedê re bû ĥebîb
Ji her derd û nexwaşan re bû hekîm û bû tebîb
Çaxa bîst û pênc salî bû ew 'ezîz û ew siltan
Ji hedreta Xedîce re bû emîn û bû sewran
Xedîce jinek pir zengîn bû, hem ji malek xanedan
Xudan mal bû, xudan milk bû, xudan dem û xudan dewran

Seyîbe bû, ermel bû, zewc û mêrê wê tunebû
'Ezîz bû, keça Xuweylêd xatirê wê pir zêde bû
Xedîcê dît ji Mihemed emniyet û hem fayîde
Eşqa wê li ser wî zatî ro bi ro bû zêde
Got ya Mihemed tu emîn î, tu 'ezîz î, tu sadiq e
Ez talib im, min qebûl ke, ez li ser te bûme aşiq e
Bi emr û ferman û bi teqdîra Rebê cîhanê zûl celal
Mihemed bi xedîcê re bû heval û bû ĥelal
Di eĥwal û şana wî de pir in çêrok û ĥîkayet
Pir derketin ji wî ĥal û îrhasat û mu'cîzat[1]
Hûn dixwazin ger bibin ji arê dojehê necat
Li ser navê wî xweş bidin hûn selam û selewat

[1] ارهاصات ومعجزات .

## Beyana rîsaletê

Çaxa sal û temenê wî xweş kemala xwe dît bû çel temam
Xelata rîsaletê hat ji wî re bi îkram
Ji ba Xwedê jê re hatin weĥî û tenzîl Quraan û ayat
Sûra ''îqra'' bi fermana Xwedê li destpêkê ji wî  re dahat
Weĥî û rîsaleta xwe wî wê çaxê dikir beyan
Got zani bin ez im pêxemberê axir zeman
Got win Xwedê yek zanib in, ji min resûl min pêxember
Ez resûl im, ez xelîl im, ez delîl im, ez rehber
Ne kahin im, ne rahib im, ne şa'ir im, ne eĥbar
Ez delîlê rêka ĥeq û rêka rast im aşîkar
Hiçet û delîlê min e, Quraan û ayatên kerîm
Ji ba Xwedê ji min re hatî ew Quraan û gotina qedîm
Bi liĝet û zimanê Erebî ye Quraana celîl
Bi fermana Xwedê ji min re anî şandeyê Xwedê ew cibrîl
Çaxa wî siltanî rîsaleta xwe dikir beyan
Hinan bawer kirin hatin bûne mumin û misliman
Hinek jî 'asê dibûn û li ser kifrê baqî diman
Vê re gotin, tu saĥir î, tu virek î, bûne dijman
Ebû Cehil eşraf û e'yanên Mekkê giş kom kirin
Li hev rûniştin, bane xudiyên kitab û Tewrat û zanîn kirin
Vê re gotin ey rahiban, ey eĥbaran ehlî kîtab
Ji emr û karê Mihemed em dixwazin ji we yekî cewab
Gişan bi hev re kirin şorek xudanên ar û 'ezêb
Gotin ewê saĥir û şa'ir û cazûwe ye him kezzab

Leheng li hev rûniştin bi hev re kirin soz û qirar
Zana û cahilan tev de bi hev re kirin înkar
Gotin eger li kuştina vî nebe çare nabe aşîkar
Li ser me namîne nav û şeref şuhret û i'tîbar
Herkes bi qasî ĥal û qudreta xwe li wê dilebitîn
Giştik ji bo kuştina wî siltanî dixebitîn
Bi wî kirin pir 'etab û pir ceza û pir 'ezab
Li ser navê wî pir selam û selewat vê hesab
Weĥî û nîda hat ser Ehmed lawê Ebdella û Emînê
Got tu ji Mekkê bar ke here law bajarê Medînê
Çaxa fermana hicretê hat ji ba Xwedê bû teĥqîq
Bi eşq derketin ji Mekkê ew û Ebû Bekir El Sidîq
Muşrik û munafiq sibê rabûn ew pê hesîn
Siwar û peya tev de rabûn ketin dû û li pê bezîn
Rê girêdan çiya û banî ne dihîştin pir lê gerîn
Xudanê cîhanê Rebê 'alemê sitirandin wan ew ne dîn
Yek miĝare li çiyayê Herrayê hat pêşiya wan nagihan
Her du dostên Xwedê ketin wê miĝarê bi eman
Bi fermana Xwedê Tîb şîn bû li ser miĝarê bûye dar
Kevok hat û pînik çêkir li ser darê kir qerar
Bi fermana Xwedê bak rabû bakî hêgin bakî sar
Li ber devê miĝarê kom kir qûm û toz û hem ĝûbar
Pilindir hat û pînik çêkir li ser darê ey guhdar
Taku şopa lingê wan nebin açiq û aşîkar
Mu'cîzatên wî siltanî pir in vê ĥed û vê ĥesab
Eger giştik werin gotin bi serî nakin kaxiz û kitab

Gawiran vê re gotin eger tu pêxember û tu emîn î
Mu'cîzatek em dixwazin xuya bikin li me mînî
Got bixwazin ey qewmê gawir û bê kîtab
Bi fermana Xwedê ez ji were xuya bikim beyan
Got em dixwazin ev hêv li ezman bi du perçe be
Were di paşila te de temam bibe derkeve
Ji bajarê Mekkê derketin qewmê gawir tev mêr û jin
Li ser çiyakî giştik kom bûn mumin, gawir, dost û dijmin
Ew sekinî li dîwana Xwedê wî du rik'et li mêj kir
Dest vegirtin got Xwedêwo tu zanayî ban Xwedê kir
Got Xwedêwo tu zana yî ya Reb tu 'ellam El ĝuyûb
Tu du'aya min qebûl kî ya Reb tu min nekî mehcûb
Bi pêçiya îşaretek da hêvê wî racî[1]
Bi fermana Xwedê hêv li 'ezmên di nîvî re bû du cî
Her du perçên hêvê ketin paşila wî ey heman
Derket û çû ciyê xwe bi fermana Xwedê tev temam
Disa bawer ne kirin gawir munafiq muşrîkîn
Vê re gotin ji siĥra te re ya Mihemed aferîn
Wî carekê bi rojê re got ya rojê hilmetê
Roj hilnehat bi gotina Mihemed nebiyê ummetê
Çarekê jî roj çû ava got rojê rabe bi ferman
Bi fermana Xwedê roj hilat û feyd û nûr da erd û ezman
Sersiya wî tu caran ne keti bû ser erdê
Ewrekî sipî tim di ser wî re diçû bi fermana Xwedê

[1] من الرجاء .

Kêç û sipî, mêş û pîşo qet li ser wî danedihatin
Ĥaşa kûçik ne diçûnê hevna giştik mu'cîzat in
Çavên wî bi şev bi roj dûr û nêzîk yek didîn
Guhên wî şor dibîstin ger bi dizî ger bi qêrîn
Giştik yek bû rûyê erdê dûr û nêzîk xerb û şerq
Bi fermana wî erd û ezman, ba û baran re'd û berq
Teneyê xurmê bi destê xwe yê mubarek wî kir erdê
Di wê gavê de ew bû dar xurme ketê bi fermana Xwedê
Eger wî ferman bikira li çiya û çeman, li kevir û daran
Ji cî hildibû dihate ba wî tev kok û hem tamaran
Ez çi bêjim mu'cîzatên wî pir in vê ĥesab
Giş beyan in, derqerar in, derĥedîs û derkitab
Ew ĥebîb û dostê Xwedê taca serê enbiya ye
Ew Ehmed û Mihemed e, ew ĥebîbê kibriya ye
Hem ewel e, hem xatim e, hem şefî' e û hem efdel[1]
Ew nasixê dînê betal Lat û 'Izze û hem Hubel
Lo birano li ser navê fexrê cîhan û kaînat
Ji can û dil de hûn bibêjin esslam  û sselat ﷺ

[1] شفيع وافضل .

# Beyana Mi'racê

Hûn guhlênin birader û guhdarên xudî kemal
Di şevekê de wî didîn 'ecayib ĥal û eĥwal
Bi fermana Xwedê kewn û mekan di wê şevê de wî firyan kir
'Erş û kursî erd û ezman ar û buhuşt giş seyran kir
Ji dest zor û zulm û cefaya gawiran ew resûl
Li mala meta xwe Diya Hanî xew kiri bû bi keder melûl
Xwedê ban kir bi 'izz û celal got Cibraîl tu emîn î
Di cih de bisekin tu zikra xwe, tesbîĥa xwe biterkînî
Hedretî Cibrîl berda zikir û tesbîĥ li wê gavê
Bendewar bû li ĥukm û ferman û teqdîra Xwedê
Belê Cibrîl ji wê fermanê pir tirsiya û bi tirs bû
Got belkî dem temam bû, mirin hat û qiyamet rabû
Xwedê ban kir, got metirse Cibraîlo qiyamet hîn dûr e
Lê hîşev heye de'weteke bi şahî ye
Got mesekin here buhştê Cibraîlo tu bilezîne
Tac û Ĥile, kember û Bûraqekê ji min re wîne
Bibe here ji ĥebîbê min re silama min li wî dîne
Bêje Rebê te got bila were ew carekê min bibîne
Derĥal perwaz kir Cibraîl bask vekirin bû teyeran
Tac û Ĥile, kember, Bûraq anîn ji wî re derzeman
Cibraîl Bûraq anî Ehmed bi rê de pesinî
Anî hat û li ber mala Diya Hanî disekinî
Vê re hatin ji ezmanan bi hezaran rûĥ û melek
Ew hatin bibînin şandeyê xulqeta hemû felek
Cibraîl got lo birawo Mihemed mesekin rabe

Lo mizgîna min li te be ey siltano tu pir şa be
Ji te re heye ferman û silava xelqê cîhanê
Got bila ĥebîbê min were ezmanê min û sêranê
'erş û kursî lewĥ û qelem sirra mezin hemû felek
Bendewarê hatina te ne ehlê ezmên hemû felek
Giştik dixwazin rûyê te yê pak û bi nûr bibînin
Çav û rûyê xwe di lingê te bidin selewatan bikşînin
Were em herin lo tu mêvanê Xwedê yî ey Mistefa
Rêka te dinêrin hemû melaîke xudanê sefa
Rûhê enbiya tev vê sebir û vê qirar in
Rêz bi rêz sekinîne li rûyê ezmên bendewar in
Her heşt deriyên buhuştê açiq in vekirî ne
Her heft deriyên dojehê jî girtî ne
Rabe serxwe birayê mino lo Mihemed bilezîne
Here ji xwe re hikmet û rehmeta Xwedê bibîne
Çaxa teblîĝ û gotina Cibraîl dibûye temam
Rabû hate ba Cibraîl ĥebîbê Xwedê xeyrûl enam
Cibraîl zîn girt û li Buraqê siwar kir
Qasî tu çavê xwe vekî û damrînî li Qudsê peya kir
Çaxa bi xêr gihîşte bajarê Qudsê ew bi îkram
Rûhên pêxemberan tevan dihatin didan wî selam
Erwaĥ bûn cim'et û Mihemed ji wan re bû îmam
Du rik'et li mêj kirin ji Xwedê re wana bi temam
Paşê sekir mi'rac û silimek li wira hazir e
Lingek zêr, lingek zîv e, yek yaqût û yek kevir e
Got bisimllah bi fermana Xwedê di silimê re ew hilkişî

Çû sekinî li deriyê yekê li ber ezmanê tevî pêşî

Li ber vebû bi fermana Xwedê deriyê ezmanê yekê

Melaîke giştik hatin selamgeh û bixêrhatinê

Gişan silam danê wan xatirê wî safî kirin

Yek bi yek hatin ew siltan ziyaret û tewaf kirin

Bi vê tertîbê bi vê nîşanê bi Cibraîl ew perwaz bû

Ji heft qatên ezmên ew bi 'izzet û îkram ew derbas bû

Bi xêr derbas bû ji heft qatên ezmên enwerîn

Belê wî pir hikmet û 'ecayibên Xwedê ji xwe re didîn

Çû ber 'erşê wî lingê xwe danî bû ser

Lewĥ û qelem bi hev re hatin wan jî serê xwe danî bû ber

Bi fermana Xwedê ji 'erşê derbas bû Mihemed El Mustefa

Çû sekinî li ber meqama Cibraîl sidret el muntehe

Li wê derê jî bi fermana Xwedê ji melaîkan re bû îmam

Du rik'et li wê derê jî kirin ji xwe re wesslam

Ji meqama sidret el muntehe derasbû ew resûl

Hedret Cibraîl li wê derê mabû ew melûl

Li wê derê li paş xwe nihêrî dît Cibraîl qet tuneye

Ew jî li wir sekinî got qey tiştek heye

Got zû were hevalo li eşqa Xwedê sebra min netê

Çima tu melûl bûyî li wê derê li pê min netê

Cibraîl got lo birawo ez ji te re bi îta'et im

Ez nikanim ji vir û hada derbas bim ji vir û hada ne bi ruxset im

Giş seyrangeha min heft qat ezman hemû temam

Sudret el muntehe ji min re bi fermana Xwedê sînor û meqam

Ger gavekê zêde bavêm ji vê derê bi navê te bê

Derhal ezê bişewitim bi agirê Xwedê yê xedebê
Got ger wilo ye ey birawo tu bi xêr bimîne li vê derê
Ezê herim li ber dergehê bisekinim li hemberê
Li ser eşq û dîdara wî lo birawo perwane me
Li hudûr û dergeha wî ez dîn û dîwane me
Eger perwane di canê xwe yê şêrîn nebuhure
Ew nabîne wesleta xwe li ber ar û nûra sor e
Çaxa Mihemed li wê derê vê rêber û vê delîl
Got rêber tune, ez xerîb im, kûde herim ya celîl
Çaxa wilo got, tiştek dahat navê wî xweş lo Refref bû
Ne ȟerîr bû, ne qumaş bû, ne me'den bû, ne sedef bû.
Tev de ji nûra Xwedê bû, ew Refrefa wekî teyran bû
Hin jî dibêjin bi gotinekê jî, wekî sicada bû
Li wê Refrefê ew siwar bû bi gotina ehlê kîtab
Derbas kirin heftê hezar perde ji nûra wî bi hesab
Paşê gihîşte meydaneke boş û tenha nagihan
Ne erd hebû, ne ezman, û ne sukan û ne mekan
Dor xwe nihêrî kesek tine, ma bi tenê ew ȟebîb
Got kûde herim, ez xerîb im Xwedawo ya Reb ez xerîb
Tirs û xişyet, mest û heyret heman li wî bûn diyar
Di nav nûrê de mest û xerq bû, ji nûra Xwedê tev de bû nûr
Wê çaxê Mihemed ban kir got ya xwedawo û got ya Ellah
Ez xerîb im, rê nizaninm ji min re bişîn delîl pinah
Çaxa wî ban Xwedê kir got ya Ellah wî kir fîxan
Perda xeybê ji ser xwe rakir xwe ji wî ve kir beyan
Bi çavên seriyan wî dîdara Xwedê didî ya welî

Belê cih û ber û dema wî ne xuya bû ne bêlî
Çaxa cemal û dîdara wî dît û kir şahîde
Hemû derd û eĥwalê xwe jê re kir 'erd û îfade
Ya Mihemed tu li me bikî roja ĥeşrê şefa'etê
Em jî bibînin dîdara Xwedê li nav cînan û bihuştê
Çaxa cemala wî dît vê cih û vê cîhat
Got el teĥiyyat lîllah wesselewatûll teybat
Xwedê jî got li ser te be selam û rehmet û berekat
Wî jî got li ser 'ebdên min û saliĥ û salîĥat
Cibraîl bihîst li meqama xwe teĥîyyat û selam
Wî jî gotina şehadetê got teĥîyyat kir temam
Xwedê ban kir got ĥebîbê mino bixweze ez comerd im
Tu çi bixwazî lawo 'ezîzo û bi 'izz û celal ezê bi te dim
Lo ĥebîbê mino bixwaze ez xudan dewran û emlak im
Ezê hemû dilgo û mirazê te lawo îcra kim
Law mêvanê mino bixwaze ez ğenî me, zengîn im
Li cîhanê û axretê ezê karê te bibînim
'Erş û kursî lewĥ û qelem hemû felek roj û qemer
Erd û ezman cin û însan hemû melek hem derya û berr
Kewn û mekan çax û zeman rojava û rojhilat ser û ber
Bi fermana min e hemû bican dar û nebat hişk û ter
Kevir û ax, ar û av, berf û tûlî, ba û baran
Hemû heywan dimeşe, difire teyrê ezman masiyê deryan
Giş guhdarê ferman min in der zeman û ber ferman
Ez xaliq im, ew mexlûq in, ew leşker in, ez siltan
Padîşah im, ez siltan im, ez hakim im li ser wan

Bi destê min e girtin berdan emr û ferman kun fekan
Evna giş min çêkirin bi destê xwe yê qudretê
Ez qadir im xera bikim bi şorekê vê si'etê
Bixwaze ji min emr û fermana te çî ye ya hedret
Ez bi te dim vê qîmet û vê minet û vê reşwet
Fexrê cîhan got ya îlahî ya Xweda û ya padîşah
Tu qadir î, tu hekîm î, tu siltan î, hem tu şah
Li ser nefsa min xwasteka min Xweda û ya Reb ji te tune
Lê qisaweta ummeta gunehkar li ser min e
Xweda û ya Reb ev ummeta gunehkar û hem ze'îf
Mexfîret ke bi reĥmeta navê xwe yê xefûr letîf
Ya Reb navê te yek reĥman û yek reĥîm û metîn e
Tu ummeta min bi arê dojehê neşewtîne
Rebê cîhanê got ya Ehmed û Mihemed ya ĥebîb
Min tu ji derd û janan re kir derman û kir tebîb
Her çaxê dilgo, miraz û lava te qebûl e
Tu ĥebîb e, tu xelîl e, tu nebî ye, tu resûl e
Tuyê min e, ezê te me, tu dilşad û bextiyar e
Heyîna min giş ji te re lo baxşîş û yadîgar e
Min fermana ummeta te ya 'asê da te ey ĥebîb
Min ava hewda kewserê ji wan re kir rizq û nesîb
Eger yek ji ummeta te guneh û hem xeta bike
Poşman bibe bi dilê xalis istîĝfar û tobe bike
Ger venegere li ser tobe û istîĝfarê neke 'issyan
Ezê biborim gunehê wî bi navê xwe yê xefûr reĥman
Reĥim û mexfîreta min pir e ya Mihemed vê hesab

Di tu deftera hilnetê vê defter û vê kitab
Min xuliq kirin ya Mihemed sed xezîne ji reȟmê
Kes nizane mezinbûna van beȟran ji qudretê
Min yek ji wan taybet kirî ji cîhanê re paşî netê
Nod û neh min hilînane ji roja teng û axretê
Paşê şertên Îslamiyê Xwedê ji wî re kirin beyan
Lê pir çetin û pir mezin bûn ji min re pir giran
Rojê pêncî çax nimêj Xwedê ji min re kir ferman
Got ummeta min ze'îf e Xwedê û ya Reb bar giran
Ji te minet rica dikim tu ji min re îkram bikî
Tu vî barî sivik bikî ji ummetê re îȟsan bikî
Her carê wî hin jê danîn ta man pênc çax temam
Got bes e ya Reb ez razî bûm ya zûll celal wel îkram
Çaxa Xwedê ji ummetê re barê giran sivik dikir
Çû secdê got ez razî bûm Xwedê û ya Reb ji te re şukir
Doz û îcabeta xwe wekî lazim îcra kirin
Di serî de soz û qerar şert û şûret bi hev re kirin
Got şukur ya Reb dilgo û mirazê dilê min qebûl bû
Qisaweta ummeta min Xwedê û ya Reb ji ser min çû
Eger gotinên mi'racê giş werin gotin temam
Ta roja qiyametê temam nabin ey e'wan[1]
Teȟiyat û selam û meqal û kelam bûne temam
Paşê melaîke hatin ziyareta xeyrûl enam
Melaîkan gotin mi'raca te pîroz be ya resûl

---

[1] يا اعوان .

Şefa'etê li me jî bike roja ĥeşrê roja mehûl[1]

Li şana te got xaliqê erd û ezman û eflak
Ne ji bo te ba, ne ji bo te ba min xuluq ne dikirin eflak
Ya Mihemed tu ji neslê temîz tahir û pak e
Roja ĥeşr û qiyametê bi şefa'eta xwe me şa ke
Paşê Xwedê ban kir got ya Cibraîl tu emîn î
Ew ĥebîbê min li seyrana baqî bigerînî
Dojeh û bihuştê Cibraîlo tu lê bimînî
Bila here 'ezab û reĥmeta min bi xwe bibîne
Cibraîl ket pêşiya Ehmed bir li seyranê digerand
Dojeh û bihuşt, 'ezab, reĥmet, mîzan sîrat giştik lê mand
Heft qatên ezmên giştik seyran kir û ew lêgerî
Çiqas qudret û hikmeta Xwedê hebûn wî giştik dî
Dewran û seyrana Ehmed ya Reb şukur bûye temam
Li ser navê wî siltanî hûn bibêjin selat û selam
Çaxa ew hat û vegerî ji 'erşa û ji seyran
Yê ku dîtiye ji al û esĥaban re giş kir beyan
Hinan bawer ne kirin ji dewran û mi'rac û seyranê
Hinan jî bawer ne kirin ketin şubhe û gumanê
Ebû Bekir heval û yarê miĝarê wî kir tesdîq
Mihemed navê wî lê danî Ebû Bekir El Sidîq
Hele sekin çi hikmet çi qudret û çi kerem e
Ewqas meqam, cih, 'alem seyran kirin, hat ciyê xwe yî germ e
Mewlîd û mi'raca hedret Mihemed bû temam e
Li ser navê wî heftê hezar selewat û hem selam e

[1] اليوم المهول (يوم القيامة) .

# Nesîĥet

Fexrê 'alem lawê Adem nebî Mihemed Mustefa
Got win zanin ev cîhan e, cihaneke fena ye bê wefa
Nema ji pêxemberan û ewliyan û eshaban û esfiyan re
Nema ji hekîm û mîr û milûk û hem ji eşqiyan re
Yê ku tê, yê ku dere ey birader qet netê
Gerek e tu jî jê hilînî zanîn û 'ibretê[1]
Mal û milkê vê cîhanê emanet û muweqqet e
Ticareteka bi vira ye tim ziyan û xesaret e
Warê cihanê, warê mixennet derewçî ye bi vira ye
Ciyê derd û jana ye, ciyê cûr û cefa ye
Rêk û cadak dûr û dirêj li pêşyia me heye
Em giştikê tê re herin, çare îmkan qet tuneye
Lê ew rêkek pir çetin e, pir bi xof û pir bi tirs e
Ey birader pir lazim e mera pêş de pê bipirse
Bi mal û milkê vê cîhanê aman kok meĝrûr mebin
Aman aman xafil mebin lo birano hûn kor mebin
Mal û milkê te kom kirî, bi cefa û ew bi 'ezab
Giş wê ji te re bi dijmin be, bi kar be, bi ĥesab, bi cewab
Eger mal û milkê cîhanê tev de jî yê te be
Ger dewlet û se'adet û îqbala te jî pir hebe
Rizq û qismet û nesîbê te ey birader ger zêde be
Belkî çar gaz cawê sipî jî bi qismet û nesîbê te be

[1] العبرة .

Bi temenê xwe yê kin û dirêj meĝrûr mebe wê derbas be
Wek lêmişta tava buharê bira tu qet lê hay nabe
Mirin ji me re tim hazir e, pir nêzîk e, qet ne dûr e
Roj û şevê pênc caran bang me dike gora kûr e
Ey mirovo tu li ser erdê dimeşî û dikenî
Lawo tuyê werî nava min bi girî û bi ĥeznî
Ey mirovo te li ser erdê dixwar û vedixwar
Wê te bixwin di zikê min de kêz û kurm û mor û mar
Ey mirovo tu bi dê û bav bû, bi law û bira
Di zikê min de tuyê bimînî vê heval û vê çira
Ey mirovo tu digerî û dimeşî li ser qametê
Tuyê ĥebsî bî di zikê min de ta roja qiyametê
Ey mirovo tu li ber nûra hêv û rojê digerî
Tuyê bimînê di zikê min de, di şeva reş û hem tarî
Piran gotin belkî cîhan tiştekî rind û şabûne
Paşê ew pê hesiyan ew ne tu tişt e û poşman bûne
Ji malê cîhanê law birano aman ji binî de hez mekin
Meĥebeta wî mirdarî ji dilê xwe yê pak çakin
Ji nerindiyan tu bireve were rindiyan bike qebûl
Xudanê rindiyan li cihan û axretê nabe melûl
Yê ku here vê cîhanê yê ku here 'aqîbet
Mal û meskenê me yê kevin e axîret
Li cîhanê eger heba ji dest mirinê xelas meded[1]
Hedret Mihemed wê li cîhanê bima ebed

[1] المدد .

Şêst û sê sal li cîhanê ji bo me temam kirin
Rêka dîn û şerî'etê wî ji me re nîzam kirin

## Lava mewlîda şerîf

Hûn guneh û xetayên xwe istîĝfar û fikir bikin
Her demekê navê celal hûn ji xwe re zikir bikin
Roja ku Îsrafîl rabû bi frmana Xwedê puf kir ssûr
Îcra dibûn ĥeşr û neşr, hesab mîzan, be's û nişûr
Ger li berrê, ger li beĥrê, ger nêzîk û eger dûr
Bi fermana Xwedê gişê rabin ji gora reş ji gorna kûr
Eger însan, eger ĥeywan, eger cin eger Şeytan
Eger melek, eger pêrî, eger 'efrît û hemû can
Her kesek wê ji bin 'erdê derkeve ew pir bi tirs e
Qet kesek li ĥal û eĥwalê kesekî napirse
Bes hedretî Mihemed wê rabe dû wê qiyametê
Qet li ĥalê xwe napirse wê bêje wey li min ummetê
Ta lêborîna ummeta xwe ji Xwedê nebe ew resûl
Tac û Buraq jê re werin siwar nebe neke qebûl
Ey birader tu bike ferz û wacib û sinnetê
Taku Mihemed fexrê c'han li te bike şefae'tê
Eger ku adaa[1] ne kir ferz û wacib û sunnet
Tu ji Xwedê re nebî kole û ji Mihemed re nebî ummet
Xweda û ya Reb tuyê ji me re bikî delîl bikî şefî'
Tu nefesa zalim û nebaş li ber me bikî mutî'[2].
Ya Reb tu me ji wê re bikî layiqê qewm û ummetê
Taku ew jî li me bike xudaniyê û şefa'etê

[1] . اداء
[2] . مطيع

Ya Reb tu me ji rêka rast û rastiyê şaş nekî
Li roja ĥeşr û qiyametê tu me bi tirs û telaş nekî
Tu li kolê xwe werî reĥmê, bi reĥma xwe ya zûl celal
Em dîdara te bibînin li bihuştê bi kemal
Muĥbeta wî di dilê me de tu zêde bikî
Şefa'eta wî ji me re bê ĥîcab û perde bikî
Xwedê û ya Reb bi ĥurmeta ew siltanê cîhan
Tu werî reĥmê li kolê xwe muminat û muminan
Em rûreş in gunehkar in, ya Reb em pirqusûr in
Em kahil in, em cahil in, ji 'îbadeta te em dûr in
Sergerdan in, em xafil in, em meĥcûb in, em xor in
Lê em li hêviya navê te yê xefûr in
Tu bi reĥma xwe li me werî reĥmê ya kerîm û ya reĥîm
Ĥal û eĥwalên me giş me'lûmê te ne ya 'elîm
Her demekê em ji te rica dikin ya Ellah
Tu lava û niyaza me qebûl bikî ey padîşah
Ya Rebî tu me ji şerê nefsê û Şeytên xelas bikî
Bi lez û bi selamet di ser sîratê re me derbas bikî
Ya resûlullah tu resûlê hemû cîhan ins û cin
Tu şefî' û meded ĥebîbê sedr û dîwana mezin
Şefa'et bike li me muznib û gunehkar û 'asiyan
Nefs a pîs e, bi me dike xerapiyan û nerindiyan
Hêvêdarên borîn û reĥma te ne ya Ellah
Em daxwazê meĝfîret û şana te ne ey padîşah
Xwedê û ya Reb tu qebûl bikî mewlîda me û qîraetê
Tu mexfîret bikî hemû ehlî Îslam û va civatê

Herkesî tabi'ên Quraanê vê qebîlê vê ummetê
Ya Reb pev de em herin wê cîhanê wê bihuştê
Dê û bavên me jî hemû yar û bira û mumînîn
Cid û kalê me û tev mumînatan ecme'în
li ser ruĥê enbiya û ewliya û murselîn
li ser ruĥê esfiya û zana û 'abîdîn
Li ser ruĥê tev miriyên mumînîn û muslîmîn
Li ser ruĥê ehlê îrşad meşayixên kamîlîn
Li ser ruĥê derwêşan û murîdan û zahîdîn
Li ser ruĥê tev miriyên civat hadîrîn
Li ser ruĥê muelifê vê mewlîdê vê kitabê
**MIHEMED NEZMÎ LAWÊ ELÎ** layiqê lome û 'îtabê
Li ser ruĥê dê û bavê wî 'acizî ey ixwan
Li ser ruĥê yê ku mirî bi îqrar û bi îman
Ey îxwan ey mumînan ey salîĥan ey salîĥat
Hûn bixwînin li ser ridaya Xwedê yek el ĥemd yek Fatîĥe.

**...Dawiya mewlîdê...**

## Qesîda Kurdî

Ewele min got bisimille — hem reĥmanî mezin Ellah
Tu reĥîmî xefur Ellah — tobedar im aman Ellah
Mihemed wesfa dibêye — aşiqê navê Xwedê ye
Mecnûn ĥalê li cezbê ye — hidayet bû ji Xwedê ye
Deriyê 'alî şerî'et e — Hem ferz heye hem sinnet e
Aman aman xafil mebin — li pêşiya we terîqet e
Terîqet deryakî kûr e — nav tijî feyd û nûr e
Yê dike were terîqetê — mehrûm nabe ji şefa'etê
Hûn noş bikin vê şerbetê — xelas bibin ji heraretê
Hûn werin terîqetê — reĥman bixwazin ji qudretê
Ew qudreta pir rê xweş e — benda gulan û binefş e
Rehberê şahê Qurêş e — dexîl bûm xaliqê 'erş e
Şêxê min î Haşimî ye — hem Qadirî hem Neqşî ye
Ew ewladê Rifa'î ye — Rifa'î ji neslê Elî ye
Ew terîqeta Ehmedî ye — xwe li ba wî rûreş mekin
Şerî'eta Mehmedî ye — rêya me hem neqşî ye
Yê ku zikra bawer nake — ne Îslam e mesîĥî ye
Mekin mekin înkar mekin — li ba Xwedê 'asê mebin
Çavan vekin hûn kor mebin — bi delaletê[1] winda mebin
Werin werin terîqetê — xwe xelas kin ji nedametê
Xwe berdin beĥra qudretê — hûn emîn bin ji şefa'etê
Şerî'et deryê enwer e — terîqet birca exder e
Nûra wî dayîm xuya ye — hûn werine terîqetê

---

1 الضلال .

…………………………………………………………………….

Ĥelandim ez wan çavên te    şewitandim van navê te
Canim qurban bejna te    şefa'et ya resûlellah

Çi xweş e navê te şêrîn    ĥebîbê mino nazenîn
Gunehkar im û pir miskîn    şefa'et ya resûlellah

Cemala te ya nûranî    bûyê meĥbûbê vî canî
Va pir qusûr û nuqsanî    şefa'et ye resûlellah

Xwedê zane bi sewdayê    ez bûm mecnûnê leylayê
Li derdê min bike du'ayê    şefa'et ya resûlellah

Yasîn û taha kir qesem    bi navê te û muĥterem
Meded siltanê bi kerem    şefa'et ya resûlellah

Tu yî mefxer enbiya    tu yî serwerê giya
Tu yî penaha 'asêya    şefa'et ya resûlellah

Tu yî ew siltanê kewnên    tu yî bavê Hesen û Husên
Tu yî îmamê ĥeremên    şefa'et ya resûlellah

Hawar dikim hezar carî    siba li dergehê barî
Xelas ke min gunhkarî    şefa'et ya resûlellah

Silavdarê çar yar im ez    dîlê xandan im ez
Xizan şermezar im ez    şefa'et ya resûlellah

Ey Ehmed selatê tu wîne    li ser şefî'ê xwe fexrê cîhan
Li ser esĥaba şev û roj    şefa'et ya resûlellah

## Telqîna Miriyan

Bi tevahî, li gor bawerî û adetên mislimanan, gava ku mirov dimre, tê şuştin, kefenkirin, binaxkirin û paşê tê telqînkirin. Telqîn jî piştî veşartinê li ser gorê ji hêla xoce yan şêxekî olî ve tê xwendin.

Telqîn bi xwe lave, gotin û zînine olî ne, li her deverekê û li gor her rêolekê (mezheb), pirhindik, ji hev cuda dibin. Lê belê ew bi tevahî di çarçewa zanîna olî ya derbasbûna miriyan bo cîhana din de digere. Mebest jê ew e, ku kesê mirî bersiva pirsên herdu firîşteyên hesabê gorê (Enker û Nekîr) bi şêweyekî rast bide, û ol û baweriyên xwe yên mislimantiyê yên jiyana xwe ya dinyayê diyar bike.

Telqîn ne ferza û ne jî sinet e, ew di dema pêxember de tine bû. Loma jî deqeke yeksane û hevgirtî ji telqînê re nîne. Lê belê bi tevahî, xwendina wê bûye adeteke cihgirtî, naverok û mebest wê jî li hemî deveran pir nêzîk hev dibin. Û li navça me -Efrîn- bi piranî ev herdu deqên jêrîn li ser gora miriî tên gotin, telqînek  ji mezinan re heye, yek jî nemaze ji miriyê zarok re ye.

Me ev herdu deq ji pirtûkeke kevin wergirtin û wergerandin Kurmancî. Hêviya me ew e, ku xoceyên me telqîna miriyên me bi Kurmancî bikin. Çima na!? Madam Tirk, Ereb û Ecem erkên xwe yên olî bi zimanên xwe dikin, ma çima emê jî wan erkan, û di nav de rêwresmên Telqînê, bi zimanê xwe nebêjin!? Nemaze jî, ew ji hêla milet ve û ji aliyê olî ve jî tê qebûlkirin, û bêguman wê cihê razîbûn û spasiyê be jî.

**Dr.Mihemed Ebdo Elî**

## <u>Telqîna Mirîyan</u>

### Bi Navê Xudayê Mihirbanê Dilovan

Ji Xwedayê gewre pêve tu Xwedê tunene, hezretî Mihemed pêxemberê Xwedê ye. Xweda yek e, bi tenê û bê heval e, arzî ya wî ye, malavabûn ji wî re ye, ew zindî dike û dimrîne, çêxwazî di destê wî de ye û li ser hertiştekî serdar e.

Xwedayê gewre di Qurana xwe ya pîroz de gotiye: ((Her nefsek wê mirinê bibîne, winê berdêla karê xwe jî li roja qiyametê bibînin, kî ji êgir hat dûrxistin û derbas bihuştê bû, serkeftî dibe. Xwaşiya jiyana vê cîhanê tenê ya nefsgirtinê ye. Yê li ba we xelas dibe, lê yê li ba Xwedê dimîne. Ji bilî heyîna Xwedê her tiştek fanî ye, destlat a wî ye û winê li wî jî vegerin. Hertişt li ser zemînê wêran dibe, tenê Xwedayê te yê gewre û bi rûmet dimîne. Tuyê bimirî, ew jî wê bimirin, winê li roja qiyametê li ba Xwedayê xwe bibin dozdarên hev)).

Ey evdalê/evdala Xwedê

## تلقين متوفي

### بسم الله الرحمن الرحيم

لا إله الا الله محمد رسول الله، لا إله الا الله وحده لاشريك له، له الملك وله الحمد يحي ويميت، بيده الخير وهو على كل شيء قدير.

قال تعالى: ((كل نفس ذائقة الموت، وإنما توفون اجوركم يوم القيامة، فمن زحزح عن النار وأدخل الجنة فقد فاز، وما الحياة الدنيا إلا متاع الغرور. ما عندكم ينفد وما عند الله باق. كل شيء هالك الا وجهه، له الحكم وإليه ترجعون. كل من عليها فان ويبقى وجه ربك ذو الجلال والإكرام. إنك ميت وإنهم ميتون، ثم إنكم يوم القيامة عند ربكم تختصمون)).

يا عبدالله ابن أمة الله، اذكر العهد الذي خرجت عليه من دار الدنيا الى دار الآخرة، وهو شهادة:

أن لا إله الا الله وأن محمدا رسول الله، وأن

kurê/keça evdala Xwedê, ew soz û peymana ku tu li ser wê ji cîhanê derketî û pê diçî warê axretê bibîr wîne û bi zimanekî zelal bêje: Ji bilî Xwedê tu Xwedê tunene û hezretî Mihemed pêxemberê Xwedê ye, bihuşt, agir, mirin û gor rast in, Munker û Nekîr rastî ne, pirs û bersiv, hesab û mîzan, gunevedan û lêborîn, ĥewzoyê kewserê û pira siratê jî rastî ne, ĥeşira mirov û dîtina bawermendan ji Xweda re di bihuştê de rast in, hatina qiyametê û vejandina kesên di goran de rastîne bêguman in. Tu bi Xwedê wek yek Xwedê bawer dikî, bi ola Îslamê û bi hezretî Mihemed jî, nimêj û silava Xweda lê be, wek şande û pêxember, razî bûyî.

Ev warê yekê ye ji warên axretê, û warê dawî ye ji warên cîhana fanî. Xwedê di pirtûka xwe ya hêja û pîroz de gotîye: ((Me win ji axê afirandin, emê we lê vegerînin û careke din ji bo vejînê û hesêb jê derînin)).

Ey evdalê/evdala Xwedê,

الجنة حق، وأن النار حق، وأن الموت حق، وأن القبر حق، وأن منكرا ونكيرا حق، وأن السؤال حق، وأن الجواب حق، وأن الحساب حق، وأن الميزان حق، وأن القصاص حق، وأن الحوض حق، وأن الشفاعة حق، وأن الصراط حق، وأن الحشر حق، وأن رؤية الله تعالى في الجنة للمؤمنين حق، وأن الساعة آتية لاريب فيها، وأن الله يبعث من في القبور، وأنك رضيت بالله ربا واحدا، وبالإسلام دينا، وبمحمد صلى الله عليه وسلم رسولا ونبيا.

هذا أول منزل من منازل الآخرة وآخز منزل من منازل الدنيا الفانية. كما قال الله تعالى في محكم كتابه العزيز الحكيم:

((منها خلقناكم، وفيها نعيدكم، ومنها نخرجكم تارة اخرى)).

الآن يأتيك الملكان الكريمان الموكلان المحاسبان، فلا يفزعاك، ولا يروعاك، ولا يهولاك،

| | |
|---|---|
| niha du firîşteyên hesêb ên pîroz wê werin ba te, ji wan metirse, bêzar mebe, ew afrande ne ji afrandeyên Xwedê, eger ji te pirsîn û gotin: Xwedayê te kî ye? Pêxemberê te kî ye? ol, îmam, qulbe û birayên te kî ne?<br><br>Bê tirs bêje: Xwedayê gewre Xwedayê min e, hezretî Mihemed pêxemberê min e, Îslam ola min e, Quran îmama min e, Ke'be qulba min e, bawermend û misliman hemî birayên min in, ez li ser wê afirîme, li ser wê jîya me û li ser wê jî mirime, bi ya Xwedayê gewre tuyê li ser wan jî werî vejandin û dilrihet bibî.<br><br>Xweda te li ser gotina rast rawestîne, ((Xweda mirovê bawermend li jiyanê û axretê li ser gotina rast radiwestîne, setemkaran rêwindayî dike û çi bixawze wî dike)). Ey nefsa dilrihet, bi dilekî razî li Xwedêyê xwe vegere û derbas be nava perestvan û bihuşta min a bilind û rengîn**.** | فإنهما خلق من خلق الله تعالى، فإذا سألاك: من ربك، ومن نبيك، وما إمامك، وما دينك، وما قبلتك، وما إخوانك؟<br><br>فقل: الله ربي، ومحمد نبي، والقرآن إمامي، والكعبة قبلتي، والإسلام ديني، والمؤمنون والمسلمون كلهم إخواني، على ذلك خلقت، وعلى ذلك حييت، وعلى ذلك مت، وعلى ذلك تبعث إن شاء الله تعالى وأنت من الآمنين.<br><br>ثبتك الله بالقول الثابت ، ((يثبت الله الذين آمنوا بالقول الثابت في الحياة الدنيا وفي الآخرة ويضل الله الظالمين ويفعل الله ما يشاء)). يا أيتها النفس المطمئنة، ارجعي إلى ربك راضية مرضية فادخلي في عبادي وادخلي جنتي. |

## Telqîna Zarokan

## Bi Navê Xudayê Mihirbanê Dilovan

Ji Xwedê pêve tu Xwedê tunene, hezretî Mihemed jî pêxemberê Xwedê ye. Ew bi tenê û bê heval e, arzû ya wî ye, malavabûn ji wî re ye, zindî dike û dimrîne, jîndar e û li ser hertiştekî jî serdar e.

Xwedêwo, ev zarokê ku hîn hişdar nebûye, pênûsan li ser ne kirine, şaşî û guneh wernegirtine, te bi dilovaniya xwe afirand û bi vîna xwe mirand, ew jî ji perestvanên te yên çêxaz e, Xwedawo tu wî ji dê û bavên wî re bikî pêşber, saman, lêbordar û lêborxwaz, û bi wî qezenca wan giran bikî, dereca wan bilind bikî û tebatê bi ser dilên wan de berdî. Xwedawo ta dê û bavên wî dikevin bihuştê û dilxwaziyên xwe, tu wî li ber deriyê bihuşta xwa bikî bendewar.

Gelî amadeyan, dilovaniya Xwedê li we be, Xwedê termê me û we bigihîn cihê herî bilind,

## تلقين طفل متوفي

## بسم الله الرحمن الرحيم

لا إله الا الله محمد رسول الله. لا إله الا الله وحده لاشريك له، له الملك، وله الحمد، يحي ويميت، وهو حي وهو على كل شيء قدير.

اللهم وهذا الطفل الذي لم يبلغ الأحلام، ولم تجر عليه الأقلام، ولم يكتسب الخطايا والآثام، خلقته برحمتك وتوفيته بإرادتك، وهو من عبادك الصالحين، اللهم اجعله فَرَطاً لأبويه وسلفا، وذخرا، وعظة، واعتبارا، وشافعا، ومشفعا لهما، وَثَقِّلِ اللهم أجرهما، وارفع به درجاتهما، وأفرغ الصبر على قلوبهم. اللهم اجعله مهبطا إلى باب جنتك حتى يدخلا أبواه فيها وينالا ما يتمنياه.

يا معشر الحاضرين رحمكم الله، جعل الله حطامنا وحطامكم في أعلى عليين، وأثابنا وأياكم ثواب الصابرين، وغفر الله لنا ولكم أجمعين.

| | |
|---|---|
| sewaba sebirdaran bike para me, û Xwedê li gunehên me û we tevan bibore.<br><br>Xwedêwo tu li miriyên bawermend û mislimanan biborî. Xwedêwo tu gorên wan ron, fere, rûgeş, bişahî û dilşa bikî û li xelkê goristanan biborî. Tu xudan î, tu Xwedê yî, lêbordarî, dilovanî, bawermend di bihuştê de herdem navê te yê gewre hildidin, silava wan jî "selam" e, lava wan a dawîn jî: Pesin û spasî ji Xwedayê cîhanê re. | اللهم اغفر لأهل القبور من المؤمنين والمؤمنات، والمسلمين والمسلمات أجمعين، وأجعل اللهم في قبورهم الضياء والنور، والفسحة والسرورو، والبهجة والحبور، والمغفرة على أهل القبور. إنك ملك رب غفور رحيم، دعواهم فيها سبحانك اللهم وتحيتهم فيها سلام وآخر دعواهم أنِ الحمد لله رب العالمين. |

| Lava piştî telqînê | دعاء بعد التلقين |
|---|---|
| Xwedawo.. Xoşhevalê bêkesawo, tu her heyî, herdem li ba me yî. Xwedawo tu tenêbûna me û wî hêsan bikî, li xerîbiya me û wî dilovan bî, gotina rast jê re bêjî, me jî ji riya rast dernexî, li kêmaniyên me û wî biborî ya Xwedayê gerdûnê.<br><br>Xwedawo.. Eger ew çêkar bû, çêkariyên wî pir bike, û eger gunehkar bû li gunehên wî bibore. | اللهم يا أنيس كل وحيد، ويا حاضرا ليس يغيب، انس وحدتنا ووحدته، وارحم غربتنا وغربته، ولقنه حجته، ولاتفتنا بعده، واغفر لنا وله يا رب العالمين.<br><br>اللهم إن كان محسنا فزد في حسناته، وإن كان مسيئا فتجاوز عن سيئاته. |


| | |
|---|---|
| Xwedawo.. Li wî dilovan be, wî biparêzî, lê biborî, warê wî di bihuştê de bilind bikî, dergeh û gora wî fere bikî, bi avê, berfê û zîpikan bişoyî, wekî çawa kirasê sipî ji qirêjê pak dibe tu wî ji gunehan pak bikî, maleka ji mala wî çêtir, xudanine ji xudiyên wî çêtir bidê, wî derbas bihuştê bikî û ji eşa gorê û êşa êgir biparêzî.<br><br>Selwata Xwedê li seydayê me Mihemed û mal û hemû dostên wî be.<br><br>Ji bo hezretî pêxemberê Mistefa, malbata wî, dostên wî, giyanê miriyên me û miriyên bawermendan, bi taybetî jî ji bo giyanê miriyê me yê dilovanî El-Faaaatîĥe... | اللهم ارحمه وعافه واعف عنه، وأكرم نزله ووسع مدخله، واغسله بالماء والثلج والبرد، ونقه من الخطايا كما ينقى الثوب الأبيض من الدنس، وأبدله دارا خيرا من داره، وأهلا خيرا من أهله، وأدخله الجنة، وأعذه من عذاب القبر ومن عذاب النار.<br><br>وصلى الله على سيدنا محمد وعلى آله وأصحابه أجمعين.<br><br>إلى حضرة النبي المصطفى وآله وأصحابه وإلى أرواح أمواتنا وأموات المؤمنين وخاصة روح المرحوم الفاتحة. |

===============

**Di malpera Yek-Dem, meha Cotmehê 2024.Z- 2636.K de, hate weşandin**

[www.yek-dem.net](http://www.yek-dem.net)

[info@yek-dem.net](mailto:info@yek-dem.net)


مولود حضرت محمد
صلى الله تعالى عليه وسلم

حبيبي خدي سببي خلقتا عزميسوا
عرضي لستر زماني مهدي كروماثجي
ترجمه نبويه

مؤلفي وي ثري گوندي مگروكي
عبدي خدي عاجز محمد نظمي خوجه
بشيري كائنات مبدأ مخلوقات
آيات معجزات محمد مصطفى
خدي